

Erling Ronald & Grete Sørensen Vaaland

Berengarîy çepandin

Rênimay mamosta

Tercemey le norwêjîyewe

Ako. Mudîrî

www.komak.nu

Mobbing i skolen - En læreveiledning

Erling Ronald & Grete Sørensen Vaaland

Utdanning og forskningsdepartementet

Oslo 2003

Berengariy çepandin - rênimay mamosta

Nûsînî: Erling Ronald & Grete Sørensen Vaaland

Tercemey le norwêjîyewe: Ako. Mudîrî

www.komak.nu

Oslo 2011

Em berheme be elfbêy aramî:

[Berengariy_Chepandin.pdf \(komak.nu\)](http://www.komak.nu/Berengariy_Chepandin.pdf)

Nawerok

Bo berbestin le “çepandin”	4
Pêşekî.....	5
Fakterekanî çepandin	7
Nîşane û hokar.....	10
Pirênsîpekanî “rênimay mamosta” dijî çepandin	17
Rêxistin	21
Mêtud û çareser bo fêrge.....	23
Mêtud û çareser bo astî pol	28
Çareserkirdinî kêşe	35
Encamgîrî.....	48

Bo berbestin le “çepandin”

Pêşiveçûnî buwarî fêrkarî le nêw mîlletanî cîhanda hengawî xêra denêt. Fêrge wek agir danî ferheng, yasa, rêsa, azadî û asûdeyî mirov berew dund (lutke) heldekişêt, berizwîstî û daxwazîy jîyan le paş girugalî korpeyîyewe destpêdekat. Zimanîş le pê naw wîst û arezûyda herdem xerîkî dataşî nî wişe û destewajey niwê û hawastdaye.

Dab û nerîtîş bepê rewî zeman degorêt, zorêk le diyardekanî peywendî û reftarî nêw civat dizêw debin û bekarhênanyan serwerî û şikoy mirov deşkênin. Ewey dûwênî pîroz bû emro namoye û pêçewanekeşî êsta nîşaney pêşkewtine.

Pêşkewtinî civat le fêrgewe destpêdekat. Kurdistan wek hemû welatanî rojhelatî nawerast le fêrgey ferhengsaz bêbeşe. Nek her natwanêt pê nasey xulya û daxwazyekanî mirovî serdem bikat bigire le zor buwarda paşekişe dekat.

Rêxirawî komek be dirêjayî çendîn sale le pê naw pêşxistinî fêrgey kurdistan bêwçan têdekoşêt, be sedan babetî niwêy fêrkarî, wek pertûk, namîlke, xûlî taybet bo mamosta û fêrxwaz pêşkeş be fêrgey kurdistan kirdûwe. Hawkat lem buwareda xerîkî nasandin, terceme û bekarhênanî serçawey niwêy fêrkarîye hem bo serxistinî astî fêrbûnî fêrxwaz û asûdebûnî le jîngey fêrgeda û hem bo rahêzan û serferazîy mamosta le becê geyandinî erikî erênî be civat.

Zarawey “çepandin” **Bullying** (azardan, serkirdineser, serxistineser) le seretay newedekanewe le welatanî rojawa be taybet skandînavî serî heldawe û le nêw civatda bayexêkî zorî pêdedirêt. “çepandin” wek pê nase û zarawey niwê bûwe be çetirî ser diyardekanî: azardan, serxistine ser, perawêz xistin, lêdanî fîzîkî, tane lêdan, nedûwandin, bêz lêkirdinewe, galte pêkirdin û htd...

Bêguman em diyardane le hemû civatêkda bawin, belam le hêndêk civatda çendêk lem diyardane bûnete nerît yan be tewawî bûnete rewîştêkî asayî û asûdeyî mirovyan jêrpê xistûwe. Rojane le nêw xêzan, bazar, şiwênkar û fêrge kesayetîy tak derûşênêt bê ewey kesî lê bedeng bê.

Akamî berfirewanbûnî em rewteş debête hoy geşepêdanî tundûtîjî û dûwatir kêşey komelayetîy gewrey lê dezêt. Take rêgey pêşgirtin û nehêştinî em diyardane perwerdey xêzan û fêrgeye. Ême be xwastinî wişey “çepandin” beranber em diyardeye hewiliman dawê hemû em rewîşte dizêwane bixeyne xaneêkî taybetewe û wek mîlletan zarawey taybet bideyne diyardey “çepandin” ke wek çetir û hêma hemû diyardekanî **Bullying** ko bikatewe.

Em kitêbe, rênimaye bo mamosta û kargêranî fêrge be mebestî berengarbûnewey çepandin le fêrgeda û dahêzanî kêşey reftar û kirdarî nayetye begîştî.

Ako. Mudîrî

Oslo 2011

Pêşekî

Em pertûke rênimaye dijî “çepandin”, fêrge detwanêt bo pêşgirtin û nehêştinî “çepandin” **Bullying** (azardan, serkirdineser, serxistineser) sûdî lê werbigirêt. Rênimake le layen “senterî tojînewey reftar” le zankoy şarî “stavangir” berhem hênirawe. Zanyarî derbarey çepandin pexşan dekat, pênassey dedatê, rêgey çareser û pêşgirtinî rûn dekatewe bo kargêr û mamostayanî fêrge be mebestî piyadekirdinyan le bernamey rahênanî fêrge.

Tojînewe derîxistwe 60 - 70 hezar fêrxwazî bineretî, tenya le fêrgekanî yek şarî welatî norwêjda, heftane be çepandinewe degilên, yan çepênerin (azarder) yan çepêniraw (azardiraw). Zor car amarî nîwey sal lem rêjeje pitire û herweha tojîneweke amaje be rêjeje helkîşanî roj le dawî rojî em diyardeye deken le astî welatda.

Lem rênimayeda fêrxwazan çalakane beşdarî deken le nehêştin û pêşgirtinî diyardey çepandin. Neselimandî çepandin heta rêjeje sfir pirinsîpî serekîy rênimakeye. Encumenî fêrxwazan rolêkî taybet lêreda debînet û xêzanîş wek yarîdeder sûdî lê werdegirêt.

Ezimûn pêşanî dawîn karkirdin be şeweyey sîstematîk hem be tak û hem be komel bo pêşgirtinî çepandin karîgerî başî heye û çalakî berdewam û dirêjxayen dij be çepandin sûdî û akamî çak debêt.

Be pê yasay xwêndin le destûrî fêrkarî welat, debêt fêrge jîngeyekî aram û dûr le hemû core tundûtîjyek bêt. Mindal û genc mafî hebûnî jîngeyekî fêrkarî saxlem û bê çepandinyan heye. Her boye fêrge berpirse le pêşgirtin û nehêştinî çepandin.

Çepandin

Emro beyanî Aram dîsan wek rojekanî dîkey fêrge, be sikêşewe le xew bexeber dêt, rojanî pişû em janey nîye. Em janeske, betaybet ew rojane ziyad dekat wa kuranî polî beranber hawkat legel eman waneyan destpêdekat. Emro ew rojeje. Her wek caran Şoriş û Yadgar le kolanî ser rêgey fêrge le pena darekan xoyan melaz dawe. Lepir dêne pêş û deytirsênin, Aramîş zor detirsêt. Ew dezanêt em tirsandine şitî dîkeşî bedûwaweye. Şoriş şanêk le şanî Aram dedat- be corêk baskî Aram ber sîngî Şoriş dekewêt. Şoriş her ewey dewîst, be dengêkî girewe witî “lêm dedey?” Aram witî “nexêr”, Şurş witî “diro dekey”, kewa bû Aram şayanî lêdanêkî zore. Îdî destî kird be lêdanî. Paşan Şoriş û Yadgar roştin bo fêrge. Aramîş wirde wirde be jakawî û dûdilî dûwayan kewt. Her yekem kajêrî wane mamosta hest dekat Aram zor şeket û peste- “lewaneye şew direng nustbêt?!”.

Kiçekanî polî şeşemî bineretî le katî pişûy nêwan wanekanda be dû rîz westawin û xerîkî yarî bazbazênen, her rîze le astî xoyewe be bazdan pêşî kesî rîzekey beranberî dedatewe. Dûwakesî rîzî yekem Şerimîne, kiçekanî pêş ew zor lêk nêzîkin, her delît pêkewe nûsawin. Ewan nayanewêt ber cilekanî Şerimîn bikewin. Heta norey Şerimîn dêt baz bidate nêw xaney yaryekewe. Le rîzî beranberî, norey Jaleye. Her ke Şerimîn baz dedat, Jale le şiwênî xoy radewestêt. Katêk Şerimîn le xaneke derdeçêt, ewanî dîke dest pêdekenewe. Kesyan nayewêt legel Şerimîn yarî bikat. Hemû carêk way lédêt. Le şiwênî cil helwasîn kes cilî xoy lay cilî Şerimîn helnawasêt. Ger parçe cilêkî Şerimîn hêndêk nêzîk bêt le cilekanî ewan yekser xoyanî lê dûr dexenewe. Kem car rû dedat kesêk qseyekî naşîrîn be Şerimîn bilêt, belam kiçekan be zorî xoyan le Şerimîn dûr degirin û katêk ew nêzîk debêtewe dest deken be çepçep. Hest dekeyt bazineyekî nawdîwî (dîwî- nawewe) megnatîsî nadyar be dewrî Şerimînda kêşirawe û hemû kesêk lew dûr dexatewe. Le jûrî wênêkêşan hemû fêrxwazan be cût

dadenîşin, belam Şerimîn be tenyaye. Le polî dûwemewe em rewte her wa hatwe. Zorcar Şerimîn dilî xoy bewe dedatewe ke lewaneye em şêwaze reftare le polekanî nawendîda bête gorîn.

Le fêrgey pîşenasîda katî pişûy firavîne, hemû fêrxwazan toşeyan pêye (toşe: xwardinêkî seretayîye bo katî firavînyan). Fêrxwazan toşey xoyan le canta derdênin û deron bo kantîna. Rêbuwar zor şanaze be xoy ke sinduqêkî ciwanî dirust kirdûwe û erikî waney emroy tewaw kirdûwe, ewîş derwat toşekey le canta derbênêt, debînêt hîçî lê nîye. Ew dilnyaye toşekey le cantakeyda bû, belam êsta nemawe. Katêk seyrî setlî xaşak dekat, debînêt toşekey lewêye, eme yekem car nîye toşekey lewê derbênêtewe.

Paş pişûy firavîn fêrxwazan rû dekene karge, seywan û hejîr be ristey galteamêz rêbuwar degirne ber plar û serincî hemû dewrûber be pêkenîn radekêşin, Rêbuwar bo xoşî pêdekenêt û wa pêşan dedat şitêkî asayîye, belam zû hestî kird doxeke berew xirapitir derwat û ewan pitir galtey pêdeken. Lepir yekêk witî, xwardinî Rêbuwar le setlî xaşake, îdî Rêbuwar be tewawî nefiret û bêzarî daygirt.

Rêbuwar le karge sinduqekey dozyewe, belam be şikawî. Sinduqey pêş kajêrêk zor ciwan bû, êsta tewaw şikawe. Henaseyekî qûlî helimijî. Ew pêştir şitî way beser hatbû. Wa dîsan carêkî dîke be erikî nakamyewe rûy kirde mamosta bo wergirtinî kerestey pitir. Mamosta bêzar bû! Rêbuwar to zor car twanay xotit pêşan dawê ... Bo carûbar babetî waneket têkdedeyt! Mamosta carêkî dîke be nabledilî Rêbuwar dexatewe ser erikekey û pê delêt bîrt lay kareket bêt û twanakanit bixe ger. Rêbuwar be wirî le berdem mamosta westawe û giwê le qsekanî degirêt.

Rêbuwar û Şerimîn û Aram kesanêkî çepênirawin. Şoriş, Yadgar, Jale û hemû kiçekanî polî Şerimîn be Seywan û Hejîrewê çepênerî çalakin: Ewan azarderin.

Beşî yekem

Fakterekanî çepandin

Çepandin çîye?

“Çepandin” azardanêkî fîzîkî û derûnîye beranber be kesêk yan desteyek, ca çî le layen takewe bê çî desteyek. Pêşmercî dirustbûnî çepandin hêzêkî nateraze le doxî nêwan çepêner (azarder) û çepêniraw (azardiraw) ke be şêweyekî sîstematîk û dirêjxayen rû dedat.

Azardanî fîzîkî, perawêzistin û serxistineser sê corî zor bawî diyardey “çepandin” in:

- Aram be şêwey fîzîkî azar dedirêt
- Şerimîn perawêz dexirêt
- Rêbuwar ser dexirête serî

Bew pênasey serewey çepandin derkewt ke çepandin azardanêkî berdewame û be şêweyekî sîstematîk û dirêj xayen rû dedat. Belam debêt bizanîn ke yek car azardanî fêrxwazêkîş detwanêt biçête xaney çepandinewe.

Rêjey çepandin

Tojînewe pêşanî dedat ke rêjey şêwekanî çepandin gorankariyan beserda dê, belam begîştî rêjey serekîy meylî çepandin le maweyekî dirêjxayenda herwa seqamgîr mawetewe.

Bo nimûne le fêrgekanî norwêjda, le salanî 1995 heta 2001, rêjey çepandin 70% helkişawe. Rêjey nêwan çepêner û çepênirawda, ta radyek yeksane. Rêjey berizbûnewekeş pitir le grûpda xoy deniwênêt (kesanî çepêner û çepêniraw her dû le grûpdan).

Pêwîste amaje bikeyn be corîkî niwêy çepandin ke le rêgey mobaylewe dekirêt, wek qse û kurtenamey naşirîn û dizêw. Wa derdekewêt ekterekanî em core çepandine kesianêkî dîke bin cuda lew çepênere asayîyey pêştir basiman kirdin.

Buwarî tojînewey em babete sinûrêkî danawe bo rêjey dûpatbûnewey kêşeke heta wek çepandin binasirêt. Dûpatbûnewey heftane yan mangî 2 - 3 car zor bawe ... Çepandinî çend carêk le hefteda tawî (fişar) zor girane leser kesî çepêniraw. Fêrge debêt çalakane rêgir bê le hemû corekanî çepandin, çî zûzû bê, çî degmen.

Le nêwan 40 - 50 hezar çepêniraw (qurbanî) û 20 hezarî çepênere (azarder)-da

Bepê belgey çendîn tojînewe derbarey çepandin, boman rûn debêtewe ke 5 -10 % fêrxwazanî fêrgey bineretî, heftane le layen hevalanyanewe deçepêndirên. Rêjey 10% le polî seretayî û 5% le polekanî balatir rû dedat.

Meylî (*Tendency*) serekîy çepêniraw bepê zayend û temen:

- Kuran pitir le kiçan ber çepandin dekewin

- Bepê helkişanî temen pley rêjeke dadebezêt, belam dabezîneke le nêwan kuran kemtîre le kiçan
- Hem kiç û hem kur wek yek ber çepandinî zarekî dekewin
- Kuran pitir le kiçan ber çepandinî fîzîkî dekewin, le katêkda kiçan pitir perawêz dexirên

Bepê çendîn tojînewe detwanîn amaje be pitir le 3% fêrxwazan le fêrgey bineretî bikeyn ke rojane û heftane beşdarin le çepandinî hevalyanda. Em rêjeve pêşan dedat ke pitir le 20 hezar fêrxwaz çalakane beşdarî çepandinin.

Meylî (*Tendency*) serekîy çepêner bepê zayend û temen:

- Kuran çalaktirin le kiçan, ciyawazîy rolî zayend legel helkişanî temenda heldekişêt
- Rêjeve çepênerî kur bepê helkişanî temenyan zortir debêt
- Rêjeve çepênerî kiç bepê helkişanî temenyan taradeyek seqamgîre
- Kuran pitir le kiçan be şêwey fîzîkî azarî hevalan deden, kiçan pitir perawêz xistin bekar dênin
- Hem kiç û hem kur şêwazî serxistineser bekardehênin

Çepandin be mobayl

Çepandin le rêgey mobaylewe diyardeyekî taradeyek niwêye, emeş be hoy bilawbûnewe û zor bekarhênanî mobayle wek amêrêkî peywendî rojane. Çepandin le rêgey mobaylewe hem be şêwey axaftine û hem be şêwey nardinî kurtenameye. Le herdûk haletda em core çepandine xoy cuda dekatewe lew çepandiney le civatda bawe, ciyawazyeke yektir nebînînî azarder û azardirawe.

Tojîneweyekî rûpêwî le ser 7 hezar fêrxwazî polî 5 - 10 le çend fêrgeyekî norwêjda rêjeve çepandin le rêgey mobaylewe destînîşan dekat. 1/3 fêrxwazanî polî pêncem mobayl bekar dehênin. Ew beşey le welamî bekar hênanî mobayl welamî belê helbijardûwe bepê temen heldekişêt bo serewe û le polî 10 rêjeve ew fêrxwazaney mobayl bekar dehênin degate 90%. Herweha rêjeve kiçan hêndêk le rêjeve kuran pitire.

Rêjeve çepandin le rêgey mobaylewe le layen grûpêkî fêrxwazewe şirove kirawe û bo xoyan diyardey çepandin be mobayl deselimênin. Lêreda çepandin le rêgey kurtenamewe ziyadtire heta peywendî axaftinî rastewxo. Kur û kiç wek yek le hemû polekan ber çepandin dekewin. Le 15% ew fêrxwazaney mobayl bekar dehênin delên le mawey salî xwêndinda zor car le rêgey mobaylewe deçepêndirên hem be şêwey axaftinî rastewxo hem be name, çepandinî kur û kiç yeksane lem buwareda.

Hîç peywendyekî sistematîk nîye le nêwan polekanda (le polî 4 û 5) û ber kewtinî çepandinî be mobayl le layen ew kesane we mobayl bekar dehênin. Belam katêk rêjeve bekarhêneran bepê temen pitir debêt, kêşey polekanî bala zor berfirewantir debêt.

Le nêwan kuranda rêjeve azardanî hevalan rojane yan heftane be mobayl le her çiwar kes sê kesyan degirêtewe û rêjeve ew kesane "carûbar" azarî hevalan deden degate 17,5 %. Le nêwan kiçanda rêjeve rojane û heftane 0,9% û carûbar 13,7 %. Azardanî hevalan be mobayl peywendyekî rastewxoy be astî polewe heye û rêjeveş wek pêştir basiman kird bepê temen pitir debêt. Berizbûnewey rêjeve le nêwan kiç û kurda yeksane. Katêk amaje be pitirbûnî azardan bepê temen û bekarhênanî mobayl dekeyn, kêşeke zor be xêrayî le polekanî bala berfirewantir debêt.

Çepandin le rêgey mobaylewe le nêwan kuran pitire le kiçan, her çende kuran pitir le kiçan azarî kesanî dîke dedin be mobayl, ciyawazî zayend kemtire leçaw çepandinî asayî.

Ciyawazî rêjey nêwan ew grûpaney ber çepandinî asayî û çepandinî mobayl dekewin zor nîye. Belam ew kesaney le rêgey mobaylewe azarî hevalanan deden cudan lew kesaney beşdarin le çepandinî rûberûda.

Hem le çepandinî asayîda û hem le çepandin le rêgey mobaylewe desteyek heye ke hem çepênere û hem çepêniraw. Le çepandinî asayîda em desteye zor keme û bepê temenîş kemtir debêt.

Taybetmendî rolî çepandin le helkişanî temenda zeqtir debêtewe. Em rêçkeye pêçewaneye le çepandinî mobaylda, lem grûpeda rêjey herdû layen (çepêner û çepêniraw) taradeyek le yek astda heldekişin û lew temenîşda pitir debin. Zor car rolî azarder û azardiraw bepê helkişanî temen zortir têkel debêt.

Hokar û mêkanîzimî doxî çepandin be mobayl wek çepandinî asayî şirove nekirawe. Hêndêk nîşaney hawbeşyan heye, belam kesanî çepêner û çepêniraw lem dû corey çepandin be tewawî ciyawazin. Her boye pêwîste bigerêyn bedûway hokar û taybetmendyekanî çepandin be mobayl. Çawerwan dekirêt hêndêk berbest û pêwaney taybet bekar bihênrêt bo kemkirdinewe û rêşekêşkirdinî em diyardeye. Katêk debînîn çepandinî mobayl girêdirawe be hevalan û peywendyekanî nêwan fêrge û fêrxwazewe, debêt le seretawe her heman stîratêjî û şêwaz bekar bihênîn ke bo çepandinî asayî bekar dehêndirêt,

Beşî dûwem

Nîşane û hokar

Zorcar pirsiyar derbarey nîşaney û taybetmendîy kesanî çepêner û çepêniraw dekirêt. Tojînewekan hêndêk nîşane pêşan deden, belam em nîşane û taybetimandyane bezorî lay kesanî çepêniraw xoy deniwênêt. Dekirêt bilêyn em girupe bepê pêwane û lêkdanewey forimî tojînewe astî twanayan betêkra le çaw fêrxwazî asayî dîke nizimtire. Katêk em nîşane û taybetmendyaney destînîşan kirawe rolî çepêner û çepêniraw le kesayetî fêrxwazda çespîwe. Her boye asane bilêyn kesekan meyl (*Tendency*) û taybetmendyekanyan pêş çepandin têda bûwe yan hêndêk le nîşanekan dox û karîgerîy çepandin geşey pêdawe.

Herweha debêt bilêyn amajekirdin be meylî baw natwanêt bibête pêwer û nîşaneyek bo pênasekirdinî çepêner û çepêniraw. Ciyawazî le meylî takekanî grûpda zorin, her boye nakirêt zorbey çepêner yan çepênirawan pênaseyekî taybet be pêwaney nêwend werbigirin. Meylî çepandin le nêw grûpekanda zor ciyawaz û berbilawe, boye zorbey çepêner û çepênirawan legel nîşaney pêwanekeda naguncên. Zor fêrxwazîş hen nîşaneyan têdaye û nekewtûnete ber çepandin. Em meyley lêreda wesf dekirêt debêt be ciyawaz lem babete têbixwêndirêtewe.

Çepêniraw

Zorbey çepênirawan mindal û lawî kem wire û peşewin. Ewan le barudoxî sext û tunda tirs û bêdeselatî pêşan deden, wek giryan û şilejan katêk debînin şitêk be dijiyan dewestêt. Çepêniraw le buwarî bûwêrî û xo derxistinda le jêr rêjey maminawendewen û xomitmane (mitmane be xokirdin) yan - leçaw fêrxwazî asayîda – lawaze. Ew kuraney azar dedirên hêzî fizîkiyan le jêr rêjey nêwende. Em diyardeye le nêw kiçda rolêkî ewto nabînêt. Seyr lewedaye, ruxsarî mirov hîç rolêkî girîng nabînêt le buwarî çepandinda.

Le nêwan mindalanî hawtemenda, çepêniraw kemtir xoşewîstin û zor car le mal û le pişûy fêgeda tenyan, dost û hevalanîşyan le xoyan mindaltirin.

Kêşey sozdarî zor berbilawe le nêw çepênirawanda leçaw hawtemenekanyan, bo nimûne dilerawkê, nîşanekanî xemokî, bêxewî û bîrî xokuştin. Herweha le nêw çepênirawanda êş û azarî masûlke, janesk, janeser, û helamet pitire.

Wek grûp, çepênirawan yan qurbanyanî çepandin le zor layenewe nasik û dorawin leçaw hawtemenekanyan. Belam dîsanîş debêt bilêyn ta êsta hîç binemayek nîye bîselimênêt ke em hokare debête hoy berkewtinyan.

Hîç gumanî têda nîye çepandin hokarî geşe pêdan yan rahêzanî hêndêk lew nîşangeleye le serewe baskiran. Herçend begîştî wênay qurbanîy çepandin mirovêkî nasike, belam le rastîda hemû kesêk dekirêt nasik bêt. Bo nimûne car heye fêrxwazî xawen twanay civakî û rêberayetî dekwête ber çepandin le layen hevalanîyewe, ewan wa hest deken ew kese bûwete hereşe bo ser rolî rêberayetyan. Em teknîke hêndê kes bekarî dehênin bo lawazkirdinî pêşbirkê kar, ewan le rêgey çepandinewe parêzgarî le doxî deselatî xoyan deken.

Çepêner

Begîştî çepêner (azarder) ciyawaz nîn le fêrxwazanî asayî. Bo nimûne ger çepêner wek grûp legel fêrxwazanî dîke bepê ruxsar, twanay becê geyandinî erikî fêrge û bûwêrî berawerd bikeyn, le astî nêwend û sereweda der dekewin.

Kuranî çepêner be zorî layenî fizikiyan hêndêk behêztire le fêrxwazî rêjey astî nêwend. Em core pêwaneyê le naw kiçanda hîç nexşêkî nîye.

Xomitmaney çepêner ciyawazyekî zorî nîye legel xomitmaney têkra (astî nêwend)î fêrxwazî asayî. Derbarey em base miştumir û dîdî ciyawaz le nêw pisporanda heye. Tojînewe heye xomitmaney çepêner be normal pêşan dedat, tojînewey dîkeş heye layenî nayetî (nêgetîv) y xomitmaneyan pitir rûn dekatewe.

Ciyawazîy boçûn pitir le şirovey wişe û manay xomitmane xo deniwênêt. Azarderan pitir nîşaney xemokî û bîrî xokuştin le mêşikiyandaye leçaw fêrxwazêk le derewey baziney çepandin.

Bepê berawerd çepêner be heman rêjey fêrxwazanî dîke le nêw hawtemenekanyanda xoşewîstin. Le hemankatda wa der dekewêt em selimandine pitir le layen kesani azarderî dîkeweyê yan ba bilêyn hawrewte bêt, hem le nêw pol, fêrge û derewey fêrgeşda. Em core xoşewîstye detwanêt fakterêkî nayetî bêt bo ragirtinî jîngeyekî nasaxlem û pitir pere bidat bem rewte (çepandin). Bêguman doxî dîkeş lem jîngeyeda detwanêt yarwetîder bêt bo perepêdanî çepandin û seqamgîrbûnî.

Selimêndirawe ke fêrxwazanî çepêner, leçaw fêrxwazî dîkeda, zortir xesletî tundûtîjîyan têda geşe dekat û mirovî ziyabexşyan lê deriskêt. Car heye çepandin debête pênasayî reftarî nayetîy firelayan: Çepêner wek grûp be tûre û tundûtîjîy pênasayî kirawin leçaw kesani dîkeda. Dûwatir le beşêkî taybetda degerênewe ser em base.

Barudoxî xêzan

Katêk denorîne pêwerî meylî têkra (*average tendency*), ciyawazyekî zor kem debînîn le nêwan xêzanî çepênirawan û xêzanî kesani dûr le çepandin. Hawkat detwanîn bilêyn hêndêk le qurbanyanî çepandin pitir le pêwîst le layen xêzanewe parêzgaryan lê dekirêt. Lêreda be asani têdegeyt em core daldedan û peroşîye debête hoy lawazkirdinî mindal û heldanî bo naw baziney çepandin. Herweha natwanîn be dilnyayîyewe bilêyn em doxe derencamî çepandine yan hokare, çunke mindal weha radehênêt hemîşe çawerwanî piştîwanîy xêzan bêt û bibête amirazî çepandin.

Doxî xêzanî çepêner le nêwan xoyanda ciyawaze. Em kesane le xêzanî her dû twêj û pley hejar û dewlemendî komelayetîda peyda debin. Hawkat dezanî doxî sextî komelayetî peywendî rastewxoy heye legel hemû reftarêkî dij be reftarî civakî, wek çepandin. Be zorî û begîştî xêzanî çepêner xoyan le xêzanî asayî pley nêwendî ciya dekenewe, wek naseqamgîrî peywendîy nêwan bawik û dayik, nebûnî asûdeyî, kizîy jîngeyekî rahêzî ayetî le layen gewresalanewe û nebûnî rêsa û sinûrî diyarîkiraw bo reftarî baş û ziyabexş.

Bêguman xêzanî hêndêk mindalî çepêner rolêkî nayetî (nêgetîv) debînin û bo xoyan şewaz û modêlêkin le çonîyetî baskirdinî kesani dewrûber û şewazî helsûkewtyan le civatda. Em reftarane towî serekîy çepandinin ke girêdirawe be perwerdey serekîy nêw xêzanewe.

Hawahengî le çepandinda

Be giştî qurbanyanî çepandin her çî le destyan bêt deyken bo xoparastin û xoladan le çepêner, belam hêndêkiyan carûbar reftarî weha pêşan dedin ke debête hoy bêzarî yan rakêşanî serincî çepêner. Ême le hemû halêkda çepêner be berpirs dezanîn, çon ewan hemîşe be çepandin destpêşxerî deken.

Dû cor adgarî tûreyî girîngin le reftarî çepandinda. Şeranîbûn adgarêke ke meylêkî seqamgîrane dedate mirov bo encamdanî kirdarî nayetî (nêgetîv). Pelamardan, corî ciyawazî dîkey em kirdareye.

Tûreyî meylêkî çalakî şeranî û pelamarderane le mirovda deriskênêt, katêk rûberûy doxî naumêd û alozîy debêtewe be mîzacî nayetî kirdar deniwênêt. Mêzacî tûreyî be têkra û hawaheng legel çepandinda lay fêrxwazanî polî seretayî xoy pêşan dedat, belam rêjey em rewte kemtîre lay fêrxwazî polî nawendî.

Her boye zor girînge bizanîn çî debête hander û bizwên le çepandinda. Tûreyî çalak meylêkî seqamgîrane dirust dekat le kardanewey şerengêz bo bedest hênanî destkewtî civakî. Tûreyî handere û hestî deselat be çepêner dedat beranber çepêniraw. Bem core çepêner çêj le çepandin werdegirê.

Carûbar çepandin le layen takewe encam dedirêt, belam zor car şewey asayî çepandin pitir be grûp xo deniwênît. Zor car dû yan çend kes pêkewe takêk deçepênin, lêreda hestî serbe grûp bûn zor girînge bo çepêner.

Wa bîrbikeynewe ême detwanîn wêneyek be tîşkî êks x wek le buwarî pizişkîda be kar dêt le doxêkî çepandin bigirîn. Lem wêne civatyeda detwanîn zor hokarî girîng bibînîn ke le doxî çepandinda ser heldeden û giyanêkî niwêy be çepandin deden. Wêneke debête hoy aşkirakirdinî demarekanî peywendî nêwan çepêneran. Em demarane heta dêt estûrtir û behêztir debin le doxî çepandinda.

Katêk dû yan sê kes be komel azarî hevalêk deden, lew kateda hest be yekgirtûyî deken. Hogirî nêwanyan lem kirdare hawbeşeda behêz debêt. Herweha çêj wergirtin le deste û grûp pitir behêz debêt, be hoy bûnî kesêk le derewey grûpekeyanewe: Ewîş kesî çepênirawe.

Ciyawazîy nêwan çepênerî serbe grûp û çepênirawî grûpbeder (le derewey girup) dekatewe ewey hêz bidate çepêner û pestan bixate ser çepêniraw. Herweha ême le rêgey em wêney le serewe basiman kird detwanîn çêjî behêzbûnî em grûpe le doxî beranber be çepêner bibînîn. Em karîgerîye le rêgey bêdeselatî çepênerewe deselimêndirêt. Hawkat ciyawazîy nêwan twana: Behêzî yan bêhêzî girînge bo çepêner. Ewey deskewtêkî civakî dedat be yekêk yan layenêk, her heman rewte debête hoy zeremendbûnî layenekey dîke.

Çepêner têdekoşin yekgirtûyî û hêzî xoyan le rêgey kirdewey şeranîyewe beramber be qurbanî çepandin biçespênin. Kesî çepêniraw be terîk kewtin û bêhêzî xoy deselatî ewan deselimênêt.

Hem bo kiç û hem bo kur bizwênî serbe grûp bûn behêztirîn handere bo reftarî çepandin. Kuran pitir handedirên leçaw kiçan be hoy rehend û kirdarî hêzekî. Tûreyî çalak peywendyekî ptewî heye legel çepandin, em layene kur û kiç wek yek degirêtewe. Wa derkewtwe em rewte serekîtirîn hokarî çepandine, betaybet le polekanî bala.

Bizwênî serbe grûp bûn rol nabînêt, katêk kesaneke be tenya xerîkî çepandinin. Belam karîgerî yan bizwênî hêz pêşandan girînge bo em kesaneş.

Berbestekan

Çepêner hawkat legel reftarekeşyan zorbeyan pêyan waye çepandin heleye. Be giştî hemûyan be têwrî yan zarekî mewda degirin le kirdarî çepandin û corêk le hestî xotawanbar [xo be tawanbar zanîn] le gutaryanda ser heldedat. Bo binbirkirdinî em heste le bineretda pêwîstyan be sê mêkanîzim heye bo ewey hestî xotawanbar – yan têda lawaz bê beranber be reftar û kirdarî nayetyan.

Yekem, pêş hemû şitêk grûp dîsan lêreş girîngî xoy deniwênêt. Be degmen helsûkewtî grûp wek hî tak qursayî berpirsayetî heldegirêt le reftar û kirdarî xoy. Wirdbûn yan dabeşbûnî berpirsayetî, katêk rû dedat, çend kes pêkewe karêk encam biden. Hawkat hêndêk le hestî xotawanbar [xo be tawanbar zanîn] le takî naw grûpda kiz debêt, hokareke grûpe “eweta ewanî dîkeş weha deken”. Her boye berpirsayetîy tak taradeyek le naw deçêt û dekwête jêr sêberî kirday grûpewe.

Dûwem, çepêner deyanewêt bepê têperbûnî kat mewdayekî derûnî dûr legel qurbanî çepandina pêkbihênin. Eme birîtîye le şirovekirdinî rastîyekan be corêkî weha reftarî nayetî dij be çepêniraw bixirête peywestêkî berdewam heta bem şêweyeş ewan pitir biselimêndirên. Bo nimûne çepêner deyanewêt girîngî biden be xeslet yan akarî qurbanî çepandin ke debête hoy ciyawazî ew legel emanda (çepêner). Katêk em rewte zor berdewam debêt, debînî taradeyek nîşane mirovîyekanyan le kesî çepênirawda zewt kirawe û ewende ciyawaz debêt legel kesanî dîke, heta “rewa” debînî helsûkewtêkî legel biken, rê be xoyan neden em helsûkewte dij be kesêkî dîkey nêw civat biken.

Lêreda binemay bîrkirdinewe binyad denrêtewe: Wênayekî rastî lay kesanî çepêner dirust debêt ke ewan be karî dehênin bo kemkirdinewey hestî tawanbarîy xoyan. Îdî akar û kirdare nayetyekan zor hele nîn! Le ber ewe em kirdare dij be kesêk dekirêt lewe pitirî şayan nîye. Derçûn le jêr berpirsayetî debête xû. Katêk em proseye berdewam debêt, êş û azarî wîjdanî kemptir debêt bo çepêner le katî çepandina. Wextêk rûdawekan dûpat debinewe, berbestekan bo xoyan detwênewe û lenêw deçin. Bem şêweye tak radêt fêrxwazî çepêniraw biçepênêt û le layîşî asayî bêt.

Sêyem, çepêner deyanewêt le mawey azardanda berdewam hokar û mebest peyda biken bo pitir çepandin. Kesî çepêniraw dewrûjêt û emeş pitir hanyan dedat bo azardanî xoy yan be her hoyek bêt ew doxe be xoy rewa debînêt. Kesî çepêniraw her şitêk bilêt, nelêt, kirdeweyek le xoy biniwênêt yan ne, çepêner be dijî be karî dehênin û deykene hokar bo carî dahatû. Ger bo nimûne kesî çepêniraw welamyan bidatewe û bergirî le xoy bikat, ewan be dirozî yan har tawanbarî deken. Ger çepêniraw bêdeng bêt beranberyan û hîç kirdeweyek le xoy pêşan nedat, ewan be bêrêz tawanbarî deken daway lê deken katêk rûy demyan lewe welamyan bidate. Bem şêweye çepêner “mafi em kirdare be xoyan rewa debînî” û dîsan zemîne û keş saz debêt bo çepandinî dahatû. Hemû doxêkî çepandin be şêweyek tewaw dekirêt ke ew (çepêniraw) hêştta mawyetî û kotayekêşî be hereşe bo carêkî dîke debirnewe.

Hawkat legel eweda berbestî çepêner kem debêtewe, karîgerîy nayetîş le derûnî kesî çepêniraw beranber xoy deçespêt. Kesî çepêniraw rûdawekan be destdirêjî dezanêt û têgeyîştinî derbarey xoy degorêt, îdî xomitmaney namênêt û le goşenîgay çepênerewe xoy heldesengênêt, heta degate şiwênêk hestî şermezarî û xotawanbarî derûnî degirin. Çepandineke degate cêgayek her dû la bertawî yektir bin, çepêner debînî kesî çepêniraw kol dedat û eme debêt hender bo berdewambûnyan. Ew wêneyey çepêner derbarey kesî çepêniraw le mêşikî xoyan kêşawe bûwete wêneyekî lojîkî, her boye kesî çepêniraw bekardanewey xoy deyselimênêt û rewayetî pêdedat. Kesanî çepêner çepandineke be mafi xoyan dezanî û kesî çepênirawîş be tawanbar.

Em core têgeyêştin û hokarane lêyan debêt be rastî û karîgerîy le ser axawtînyan dadenêt, katêk rûberûy rexne debinewe derbarey reftar û kirdaryan. Boye zor girînge katêk lêkoler legel çepêner depeyvêt, bizanêt em core mebest û hokarane le kiwêyewe serçawe degirin û be qazancî kê tewaw

debin. Lêkoler nabêt derfetî ragorînewe û giftûgoyan pê bidat ke heta çi radeyek kirdarekanyan raste yan ne. Le hemû haletêkda nabêt em kesane rewayetî biden be azardanekeyan û be şiyawî bizanin.

Temaşaçyan

Lew şiwêney çepandin rû dedat be zorî temaşaçî lêye. Ewan dezanin çepandin rû dedat, belam ne çalakane beşdarî têda deken û ne layenî kesîş degirin. Zor car ewan legel hevalanyan dewêstin û seyr deken çon yekêk ser dexate ser yekêkî dîke yan be şewey fizîkî azarî dedat.

Carî waş heye debînin çî rû dedat belam xoy ténageyênin. Begîştî temaşaçî zortirin lew kesaney çalakin le doxî çepandinda, lem rûwewe ême detwanîn ewan wek layenî “zorîney bêdeng” pênase bikeyn. Ger em zorîne bêdenge deng û kirdarî niwandba, beşêkî zorî çepandin nedema. Zorîy temaşaçyan detwanêt bibête hêzêkî gewre. Begîştî zorbeyan dijî çepandinin, belam zor car lêkdaneweyan le boçûnî yekdî derbarey rûdaweke heleye. Takî temaşaçî pêwaye temaşaçyanî dîke rayan beranber çepandineke ayetîye, belam le rastîda wanîye. Em têgeyîştine heleye pêş be temaşaçyan degirêt le yarmetîy çepêniraw. Ewan pêyan waye tenyan le xo dûrgirtin lew rûdawey deybînin, boye nawêrin hîç bilên. Carî waş heye takî temaşaçî çalakane legel çepênerda beşdarî çepandin dekat.

Çepênerîş hele têdegen û zor car pêyan waye temaşaçyan yarmetyan deken. Eman hest bem derike çewtey xoyan naken, leber ewe zorbey temaşaçyan bêdengî radegirin. Ger bêdengî bişkêt û yarmetî çepêniraw aşkira bêt, çepêner serçawey serincî xoyan le dest dedin. Herweha çepênirawanîş be hele boçûnî temaşaçyan lêkdedenewe. Karîgerîy azardaneke quristir debêt katêk çepênirawan debînin “hemû kesani dîke” beşdarin le çepandinyanda. Le nêwan çepêner, çepênirawan û temaşaçyan “koderikî çewt” (hele bîninêkî be komel) dirust debêt. Ewey wa hemû kes pêwaye hemû kes wa bîr dekatewe, karîgerî dadenêt le ser kirdaryan lem barudoxe taybeteda û debête handerêkîş bo dûpatbûnewey rûdawî niwê. Ger temaşaçyan le doxî çepandinî kesêkda helwêstyan hebê û yarmetî çepêniraw biden, her lewêda çepandineke kota debêt.

Kê azarî kê dedat?

Kur hem azarî kur dedat hem azarî kiç. Ewan hem azarî fêrxwazî polî xoyan deden hem hî polî dîke. Kiç be giştî azarî kiç dedat ewîş le polî xoyda. Eme nimûney ciyawazîy zayende. Pêkewebûnî kuran pitir girêdirawe be çalakîyewe: Ewan pêkewen leber ewe seriqaî yek basin. Mercî em core peyweste - pêkewebûne - pêwîstî be hawrêyetîy tokimey nêwanyan nîye: Ême hevalîn leber ewe pêkewe yarî topî pê dekeyn. Katêk xalî serekî peywesteke wa bêt, mirov detwanêt qurbanîyekî çepandin helbijêrêt ke baş naynasêt. Dekirêt çepandinîş çalakî peywesteke bêt (xalî peywendî bêt).

Le peywest - pêkewebûn - y kiçanda zor car peywendî hawrêyetyeke girîngtîre: Kiçan pêkewyn leber ewey hawrên. Ewan pêkewen le çalakîyêkda leber ewey deyanewêt pêkewe bin, çalakîyêke taradeyek dekewête dûway hawrêtîyêkewe. Destpêk awa bêt, karîgey çepandin le nêw kiçanda arastey kesêk dekirêt peywendî legelîda heye, betaybet kesêk deyewêt le peywestî çepêner bêt. Ewkat perawêz xistinî zor pir azartir debêt, bem şeweye aşkira sinûr diyarî dekirêt ke kê boy heye le peywestda bêt û kê boy nîye.

Hêndêk fêrxwaz hem çepênere hem çepêniraw. Em kesane pitir le layen hawtemenewe deçepêndirên û xoyan fêrxwazî kem tementir deçepênin. Eme şewazîke le ragirtinî hestî xomitmane

(mitmane bexo bûn). Katêk bo xot qurbanî çepandin bît û bitwanît kesî dîke biçepênît, rastewxo ast û şiwênî çepêndirekanî xot degirîte.

Astî pol

Rêjey çepandin le polêkewe bo polêk zor ciyawaze, belam em ciyawazye zore ne tenha paşxanî xêzane û ne tenha zorîy jimarey fêrxwaz le polda. Zor car rêjey çepandin le polî biçûk wek polî gewreye. Geşey barî civakî naw pol taradeyek serbexoye û peywendî bem layenewe nîye, em şêwazeş karîgerî debêt le rêjey çepandin. Nîşaney ew polaney kêşey helsûkewt û çepandinî têdaye degerête bo nebûnî asûdeyî le nêwan fêrxwazan, bûnî fêrxwazanî terîkxiraw (perawêzxiraw), peşokan û jîngey nayetî. Em core polane hîç rotînekîyan bo çonîyetî encamdanî erik le katî waneda nîye, peşewî û kizî sêregirtin (cexitkirdin) bal dekêşêt be ser polda.

Rewîşt û rêsa lem core polaneda le jêr karîgerîy derikî çewtda xo deniwênêt, bo nimûne bûnî rêsay nayetî û cexitkirdin Leser riwaletî em û ew. Le keşêkî wa narûn û naasûdeda debêt fêrxwaz milimilanê bikat bo diyarîkirdinî şiwên û astî xoy û radey karîgerî danan û serbe grûp bûnî xoy. Amirazekan lêreda debine çepandinî heval, betaybet ew kesane ke layenî civakiyan her le seretawe lawaze le polda. Betaybetî em core jîngeye handerêkî tirsinak debêt bo ew kesaney le xêzanewe paşxan û meylêkî çepandinyan têdaye bo azardanî xelkî dîke katêk zemîne rexsaw bêt boyan. Em core fêrxwazane xêra yekdî denasinewe û yek degirin bo niwandinî kirdarî nayetî dij be hevalan.

Berêwebirdinî lawaz le layen mamosta û karbedestanî fêrgewe yarmetîder debêt bo dirustbûnî jîngeyekî nayetî le polda. Fêrxwazanî xawen wizey şeranî hestiyarin beranber be mamosta û le boşayî degerên, ger mamosta narûn bêt le dariştinî rêsay naw pol, ewan debine biryarder. Amancî rûnî û çalakîy mamostayan le berêwe birdinî polda karîgerîy debêt le ser saxtarî civakî û debête berbestêk bo bedireftarî û çepandin.

Astî fêrge

Rêjey çepandin le fêrgekan ciyawazyekî zorî heye. Bêguman mirov detwanêt rêjey beriz û nizamî sextîy doxî xêzan le fêrgeyekda şirove bikat, belam eme nabête hokar yan welam bo ew ciyawazye zore. Tenanet ciyawazîyekan peywendî be şiwênewe nîye, wek ewey fêrge le şar bêt yan gund, tenanet gewre û biçûkîy fêrgekeş rol nabînet. Şîmane (ihtîmal) heye zorîy ciyawazî nêwan fêrgekan bigerête bo doxî nêwan mamostayan û berêweberayetî fêrge. Kizîy hawkarî nêwan mamostayan û lawazî berêwebirdin palinerêkî nayetîye bo berizbûnewey rêjey çepandin le fêrgeda. Kêşey nebûnî hawkarîy nêwan mamostayan debête hoy geşe nesendinî astî twanayan. Em core kêşeye debête hoy nebûnî piştîwan bo takî mamosta beranber griftî naw pol û berêweberî fêrge le dananî planêkî puxt û amancî diyar bo fêrxwaz.

Encamgîrî derbarey hokarekan

Doxî nayetî xêzan meylî azardanî kesani dîke lay fêrxwazan be hêz dekat. Bêplanî, nebûnî rotîni rûn û bûnî rêsay nayetî xoy le xoyda pêkhênerî binemay çepandine le polda. Hebûnî em core jîngeye û nîşaney nayetî le takî naw pol, têkbesteyeke encamekey debête çepandin. Mamostay pol û

hawkaranî zor girîngin bo çonîyetî geşey jîngey pol. Berêweberayetî fêrge û doxî hawkarî nêwan mamostayan pêşmercî serekîye bo berêwebirdinî pol û çawdêryan le katî pişûda.

Herweha hawkarî nêwan fêrge û xêzan legel jîngey derewey fêrge karîgeryekî zorî heye le ser rêjey çepandin. Dox û hokarî çepandin taradeyek peyweste be jîngey derewey fêrgewe. Fêrxwaz xawen akarêkî taybet bexoye û zor şit le xêzanîyewe fêr debêt, belam legel eweşda hokarî wa heye le fêrge û çewey karî mamostada karîger bêt le ser rêjey berizbûnewey çepandin. Bo karkirdin dijî çepandin le fêrge pêwîste rayekî giştî selimêniraw le nêwan kargêranî fêrge û ew mercaney le çewey planî fêrkarî diyarî kirawe bixirête ger. Fêrge detwanêt em kare le rêgey girîngî dan be corayetî berêwebirdinî pol û fêrgewe cêbecê bikat. Em taybetmendî reftar û barudoxey takî fêrxwaz heyetî û pêwey dête fêrge, dekirêt heta rêjeyekî zor qerebû bikirêtewe,

Çepandin, kêşey helsûkewt û fêrxwazî lawaz (le sinûrî metirsîda)

Nîşaney hawbeş le nêwan corekanî kêşey helsûkewtda heye, bo nimûne naaramî û jawejawî katî wane, xo dizînewe, têkdan, lasarî, tawankarî û meylî çepandinî hevalan. Eme girutînêkî behêzî pêşgirtin be şeweyekî berfirewan dedate fêrge bo berengarbûneweyan. Belam hawkat babetêkî dîkeş layenî serekî em baseye: Hemû fêrgeyek fêrxwazî nasik û lawazî heye, griftî xwêndin û nûsîn, fêrxwazî xawen pêdawîstî taybet, buray derûnî û fizîkî yan fêrxwazî bê serpereşt. Em fêrxwazane le sinûrî metirsîyekî gewredan, ger fêrge diyardey çepandin û kêşey helsûkewtî têda bêt. Dekirêt bilêyn fêrgeyekî dostane û giştîgîr pêwîste bo serxistinî astî twanay em core fêrxwazane. Riwangeyekî weha berfirewan, hander û bizwênêkî baş debêt hem bo ptewkirdinî karî mamosta û hem bo asûdeîy fêrxwaz û rexsandinî jîngeyekî saxlem bo hemwan.

Beşî sêyem

Pirênsîpekanî “rênimay mamosta” dijî çepandin

Ême heta êre wek paşxan, tenya zanyarîman derbarey çepandin dawê bo pêşgirtin û berbestinî reftarî nayetî. “rênimay mamosta” dijî çepandin le senterî tojînewey reftar le zanistgey Stavangir bepê çend pîrensîpîkî bineretî damezra.

Neselimandinî hîç core çepandinêk

Le nêwan “serxistineser” -î bê metirsî û çepandinda sinûrêk heye, neselimandinî hemû şêwe kirdarêkî lem babete bûwete çawgî serekîy rênimake û watay destînîşankirdinî sinûrêkî rûn û aşkiraye beranber bem diyardeye.

Be kurtî nabêt kes rêge bidat fêrxwaz beranber be hevalî xoy bêrêz bêt, tenanet ger rûdaweke zor biçûkîş bêt. Fêrxwaz debêt hest bem riwangey mamosta bikat, em şêwazî neselimandine be tundî debête berbest bo rûdawî gewretir û çepandinî berdewam.

Gewrey salar (*Authoritative*)

Gewreyekî salar têkelîyek le piştîwanî û kontrolî xoy pêşanî mindal û genc dedat. Le xêzanda em şêwazî perwerdeye be rûnî layenî ayetîy reftarî mindal pêş dexat û layenî nayetî lawaz dekat. Heman şêwaz be rêjeyekî zor le fêrgeda nexşî heye. Em rewîşte hem le malewe û hem le fêrge karîgeryekî gewrey ayetî heye, ger gewrekan pêkewe hawkar bin derbarey em çemike, betaybet eger mindal yan genc bizanêt xêzanî legel kargêranî fêrgeda hawkarî deken. Nabêt em salariye legel xosepandinda – ke be çekî tirs û toqandin deçerxê – bixirêne yek xanewe.

Piştîwanî - gewrekan debêt le fêrgeda be rûnî pêşanî biden ke ewan peroşî hemû takêkî fêrxwazn, serinc û rêzî pêwîstyan bidenê û hawkarî layenî civakî û zanistyan bin. Eme yarmetîyekî behêz debêt bo peywendîy nêwan gewre û mindalan û herweha debête hoy pêkhênanî doxêkî baş le nêwan fêrxwazanda.

Kontrol - katêk fêrxwaz têdegen le fêrgeda gewrekan kontrolyan nîye, zorîneyan hest be peşewî deken. Boye çend berêweberêkî nayetî û naferimî le fêrxwazan kontrol degirne dest û be hele dijî mamosta û fêrxwaz bekarî dehênin. Eme nîşaneyekî bineretîye le bûnî zorî kêşey helsûkewt begîştî û çepandin betaybetî. Her boye zor girînge hemû takêk, mamosta, berêweber û kargêr twana û wîstî biryar danyan hebê, pêşanî biden ke tenha xoyan xawen biryarin û hemû twanaş dexene ger bo berbestin le helsûkewtî nayetî û le çepandin.

Tojînewe selimanduyetî ke têkbestinî piştîwanî û kontrol zor karîgere. Lêreda bo mindal û cewan derdekewêt ke mebest le kontrol selimandinî gewrekan nîye, belkû leber hawsozî û piştîwanî mindal, genc û civate begîştî. Eme wa dekat fêrxwaz rêz dabinêt bo kontrol (çawdêrî) û pitir berpirsayetî yekdî bigirne esto. Ger gewrekan bem şêweye reftar biniwênin, be baştirîn şêwe pêş be diyardey çepandin degirin.

Hawkarîy gewresalan - katêk fêrxwaz debînêt peywendî nêwan gewrekan dostaneye û le hemû babetîkda hawkarî yekdî deken, wênay deselat, rêz û hawsozî ewan pitir dekat. Zor girînge mamosta, berêweber û xêzan be kirdewe lem baseda hawdengî pêşan biden. Betaybet berêweber û berpirsanî dîke erikêkî girîngiyan le ser şane bo pêşandanî hawkarî û hevaletîy nêwanyan le jîngey fêrgeda, be corêk fêrxwaz hestî pêbikat. Wek pêşinan le efirîqa gutuyane “bo perwerdekirdinî yek mindal, twanay gişt xelkî gundeke pêwîste”.

Yekrewtî - zor hewil û çareserî baş beranber be diyardey çepandin be kar hatwe, belam be hoy reçaw negirtinî hemû layenekanî, hawaheng nebûn û nebestinewey be erikî rojaney fêrgewe serkewtû nebûwe. Eme hoy nebûnî yekrewtîye û zor car mamostayan, xêzan û fêrxwazan wa têdegen eme diyardeyekî katîye û erikî katî pêwîste û kêşeke dûway maweyekî kem tewaw debêt. Ême katêk akamî başiman dest dekewêt, pêkewe yekrewtî mêtudî dijî çepandin bibestîn be erikî rojaney fêrgewe.

Betaybetî bo maweyekî kurt karîgerîy zor baştir debêt ger hawahengî û yekrewtî le nêwan çareserî gewre û biçûkda hebêt, bo nimûne çareser bo naw pol û katî pişû le hewişey fêrge. Em şêwazeyan nasirawe be sêregîrîy yekrewtî le çepandin bo maweyekî kurt. Belam ger bimanewêt bo dirêjimewda akam û deskewtêkî başiman hebêt, debêt hemû hewil û mêtudekanî pêşgirtin be çepandin bikeyn be beşêkî asayî erikî rojaney fêrge. Em şêwazey dûwayîyan nasirawe be yekrewtî giştgîr.

“rênimay mamosta” bayexêkî zor dedat be her dû şêwazeke.

Sêregîrîy yekrewtî le çepandin: “*Bullying Focused Consistency*” hemû programêk dijî çepandin çareser û mêtudî xoy heye, kêşeke dekate nişan û amanc. Bo nimûne rêkxistinî giftûgo legel hemû takêkî fêrxwaz derbarey çepandin le seretay payîz û beharda. Amirazêkî dîkey hawşêwe derfet dan be fêrxwaze kar bikat legel babetî edebî derbarey kêşeke (çepandin). Her dû beşeke bepêy plan danirawe û hemû kes erikî bo destnişan kirawe derbarey diyardey çepandin. Herweha lêreşda yekrewtîy nêwan çareserekan reçaw degîrêt.

Rênimake le rêgey çend mêtudêkî dîkewe rastewxo pêş be çepandin degîrêt, bo nimûne giftûgo legel hemû takêkî xêzan û kobûnewe betaybetî derbarey çepandin. Dîsan yekrewtî heye le nêwan em dû şêwazey basiman kird. Herweha yekrewtî û hawahengî heye le nêwan ew çareseraney rastewxo rûy le fêrxwaze û ewaney peywendî be xêzanyanewey heye. Amiraz û çareserî her dû grûpeke peyweste be polewe. Boye ême mamosta, fêrxwaz û xêzaniman wek grûpî bineretî le fêrge nasandûwe ke lêreda pêy delêyn “pol”.

Nimûneyek le amiraz û çareserî çepandinî fêrge le rênimay mamosta tojînewey derbarey fêrxwaz, pêş bekarhênanî û salêk dûwatir. Em amiraze hawahengî û yekrewtî nêwan çareserî pley pol û fêrge pêşan dedat û karîgerî îşeke behêz dekat.

Guncandin - em mêtudeyan aloze belam karîgere. Layenêkî mêtudeke guncandinî dû yan sê babete legel yekdî û çonîyetî peywestbûnyan pêkewe. Bo nimûne berêweberî fêrge serdanî polî heştam dekat û lewêda hem le ser çepandin qse dekat û hem destxoşî le polekeyan dekat be boney ew proje başey derbarey mêjûy Usturalya encamyandawe. Em çaresere sêregîrîy yekrewtî beranber be çepandin û hêndêk pitirîş. Berêweber narastewxo delêt diyardey çepandin bepê ew standardey berêweber deyewêt le fêrgeda naguncêt.

Em core guncandine çepandin dexate nêw peywestêkî berfirewantirî babetewe bo fêrxwaz û weha dekat diyardey çepandin pitir be şêweyekî siruştî bas bikirêt û bibête hoy dirustbûnî corêk le mitmaney dûlayene. Layenêkî dîkey karîgerî ayetîy em mêtude rahatinî mamostayane bo piyadekirdinî le zor derfetda.

Ger katêk berêweber qse legel fêrxwazan dekat mamosta le polda bêt, debête hoy guncandinî peywendî nêwanyan. Fêrxwazan debînin mamosta û berêweber hawkarî yekdî deken, betaybet katêk berêweber amaje be zanyarî mamosta dekat derbarey ew proje başey ewan encamyan dawe. Eme yekrewtî û hawkarî gewrekan pêşan dedat.

Fêrge detwanêt zor şêwazî guncandinî babet û peywendîy girêdiraw be çepandinewe pêk bihênêt, ger mamosta û kargêranî fêrge birwayan be pirênsîpeke hênabêt. Le polda derfetî zor heye bo guncandinî babetekan be çepandinewe. Guncandin xoy ser heldedat ger mamosta katêkî kemîş bekar bihênêt legel babetî çepandin, be mercêk derfet guncaw bêt. Eger gewrekan bitwanin hawkarî nêwan xoyan pêşan biden, hewileke baştir yekrewtî û karîger debêt.

Yekrewtîy giştîgîr - yekrewtî be guncandinî babetewe wek pêştir basiman kird kar leser çepandin û babetêkî dîke dekat le maweyekî kurtda. Em şêwazeyan zor karîgere, belam her pêman keme. Leber ewe fêrxwazan bê mebest em core guncandine û peywendîy le nêw xoyanda rêkdexen. Belam ger ewan em rewte le mamostayan bibînin mitmaneyan la dirust debêt. Bo xêzanîş her waye. Yekrewtîy giştîgîr çêweyekî standardî hawahenge ke karîgerî le ser hemû rewtî fêrge debêt.

Şamebestî “rênimake” bayex dane be şêwazî berêwebirdin û karî rojane le nêwpolda. Baş perêwebirdinî pol xoy le xoyda pêşgirtine le çepandin. Hawkat pêşmercêkî başe bo guncandinî babetekan legel çepandin û çareserekanî.

Herweha bayexî zorîş dedat be çareser bo katî pişû le gorepanî fêrge. Bêguman em mêtud û çareserane tenya karîgerî bo pêşgirtin be diyardey çepandin niye, belkû begîştî jîngeyekî asûde û aram bo fêrxwazan destber dekat. Yekrewtîy giştîgîr çareser diyarî dekat.

Berdewambûn - hokarî serekî bo karîgerbûnî mêtudekanî berengarîy çepandin le fêrgeda, reçawgirtinî standard û piyadekirdinî çareser û şêwazekane bo maweyekî dirêjimewda. Hewilî xo le kêşe dizînewe û piştgiwê xistin tenya ziyânî lêdekewêtewe. Heleyekî baw ke zor fêrge deyken û hawkat çawenorin corayetîy fêrge baş bêt. Eweye zor car bayex be layenêk deden û layenêkî dîke lebîr deken, dîsan be şitêkî niwê cêgey pir dekenewe, ewîş le maweyekî kurtda perawêz dexirêt. Katêk fêrge babetêk be hend negirêt bê ewey mebestî bêt, hemû mêtud û çareserî kara pek dextat û ferhengî fêrge têk dedat.

Progiramî berengarîy çepandin yek salî xwêndin dexayênêt. Debêt berdeyamî bekarhênanî progirameke le mawey salda bepêy planî karî rênimake bêt. Planeke le dû beşî serekî pêkhatwe, yekem modêlî rîkxistinekeye û dûwem çalakî girêdiraw be salnamey xwêndinewe. Çalakîyekan be şêwazêkî diyarîkiraw be dûwa yekda weha rîz kirawin, hemû hengawêk zemîne bo hengawî paş xoy saz bikat.

Le beharda amadekarî bo berengarîy çepandin dekirêt û yekem rojî kiranewey fêrge le payîzda dest bekar debêt. Girînge amadekaryeke wird bêt. Hawkat debêt rojî destpêkî rênimake rojêkî taybetî bêt bo rakêşanî serincî hemwan. Berêkewtî niye yekem rojî destpêkî fêrge diyarî kirawe. Yekem roj, rojêkî taybete bo fêrxwazan û pêşandanî standardî fêrge û çonîyetî şêwazî berêwebirdinî fêrge deçespêt.

Zor girînge birgey yekem be wirdî planrîj û cêbecê bikirêt, eme bizwên dirust dekat û debête hander bo berdewambûn. Ger destpêk baş nebêt berdewamî programeke cê nagirêt. Debêt pêşiveçûn le planî salda diyarî kira bêt heta bitwanîn mêtudî niwê yek le dûway yek bixeyne ger. Debêt bizanîn katêk mêtudî niwê destpêdekat, mêtudî pêşû le bîr nekirêt. Be pêçewanewe debêt giyanî niwêy be mêtudî kon bidirêt û qûltir bibêtewe le babet heta zemîne bo mêtudî niwê birexsêt.

Le berengarîy çepandinda hêndêk rotînî çareser bestirawin be katewe, mebest lêreda sêregirtin le sîstematîk û kate. Debêt bizanîn ke rênimake wirdekarîy zorî têda bekar bêt. Bepêy pirênsîpekanî berengarîy çepandin debêt fêrge bo xoy plan û derfet rêk bixat û cexit bikate ser geşe pêdanî twana û karameyî. Rolî yekem lêreda berêweber û mamostayanî planrêj deybînin.

Dekirêt, detwanrêt û bîrokekanî

Pertûkî berengarîy çepandin rêniwênêkî zor wird nîye, plebeple hemû şitêk bo fêrge û beşdarbûwan bas bikat.

Pirênsîpekanî serewe cige lewey nasnameye bo “berengarîy çepandin”, dekirêt bibête rêniwên bo çonîyetî cêbecêkirdinî şêwazeke.

Çemikî “dekirêt”, wate mêtudî em rênimaye bo piyadekirdine, legel karî fêrgeda deguncêt. Çawerwan dekirêt fêrge le rêgey beşdarbûnî le projey “berengarîy çepandin” ewe pabend bêt be erikî xoy.

Legel emêşda çemikî “detwanrêt” bo hêndêk barudox bekar dêt heta biselimêndirêt ke em şêwazane wek destpêk pêşnyaz dekirêt. Paşan pêşnyaz yan bîrokey coracor dxirête rû.

Nêwerokî “detwanrêt” û “bîrokekan” zorî be berewe. Fêrge debêt bepê pirênsîpekanî rênimayeke û pêdawîstî û pêşmercekanî xoy huner û zîrekî le mawey yekem salî cêbecêkirdinî - û tenanet dûwatirîş - be kar bihênêt.

Ger em rewte cêbecê bikirêt, fêrge detwanêt destkewtî başî le mawey salî yekem û geşandinî corayetî bo salanî paştirîş hebêt, hem le pêşgirtin be çepandin û hem kêşey reftar begîştî.

Beşî çiwarem

Rêxistin

Modêlî têkbestiraw

Pirinsîpî serekî le “berengarîy çepandin” da pêkhênanî modêlî rêxistinî sakare. Wata heta dekirêt projeke be modêl û saxtarî rêxistinî fêrgewe bibestirêt û têhelkêş bikirêt. Em modêle nasirawe be têkbestiraw û ciyawaze legel modêlî projeda. Layenî lawazî modêlî têkbestiraw kemtir derkewtinî modêlekeye le katî cêbecêkirdinda. Progiramî hawşêwey berengarîy çepandin modêlî proje bekar dênin ke pêwîstî be dirustkirdinî tewawî heykelî dezgeyeke bo cêbecêkirdinî proje. Sûdî em şêwazeyan diyar kewtinî progiramekeye. Ziyânî bekarhênanî wize û serçaweyekî zore û katêkîş dezgeke nemênêt serleberî progirameke dexirête lawe. Ême hemû fêrgeyek handedeyn heta dekirêt modêlî têkbestiraw bekarbênin.

Katêk rênima emende bayex dedat be têkbestinî be rêxistinî asayî fêrgewe, dilnyaye karîgerî heye û çareserekanîş taradeyek diyar dekewin.

Encumen - berêweberî fêrge berpirsayetîy yekemî le estoye bo cêbecêkirdinî erikî berengarîy çepandin. Erikeye be pêkhênan û destînîşankirdinî desteyekî berpirs dest pêdekat. Erikeye em desteye xistine ger, çawdêrî û dîwçûnî (bedûwadaçûn) berengarîy çepandine. Emeş le rêgey hawkarî mamostayan û encumenî fêrxwazanewe dekirêt. Beşêkî rênimake terxan kirawe bo rahênanî wirdî hawkaran le karî pêşgirtin û bekarhênanî çareser û mêtwedkan. Hawkat erikî “encumen” piştîwanî le mamostayan û koy hawkarane le barudoxî taybetda. Herweha berpirse le pêdanî zanyarî stiratîjî bo her dû beşî nêw û derewey fêrge.

Dekirêt pêkhatay encumen heman destey berêweberî fêrge bin. Sereray berêweber, serperîştyar, rawêjkar û kesani pisporî buwarî fêrkarî têda beşdar bin. Wate em modêle berpirsayetîy cêbecêkirdinî erikî berengarîy dexate estoy berpirsanî asayî fêrgewe û nasirawe be “modêlî têkbestiraw”. Dekirêt em modêle le fêrgey gewreda yarmetî le pisporanî fêrkarî wek buwarî planrêjî, grûpkarî û derûnnasî werbigirêt.

Debêt dilnya bîn ew kesaney le encumenda kar deken hem twanay berêweberî û hem twanay fêrkaryan têda bêt, hawkat dekirêt serokî encumenî fêrxwazan endamî em desteye bêt.

Layenêkî behêzî dîkey modêlî têkbestiraw, rastewxo serperîştîkirdinî babet û kêşekane le kobûnewekanî berêweberayetîy asayî fêrge. Herweha lem kobûnewaneda hemû griftekanî fêrge dexirête ber bas û peycorîy (lêkolînewe û tehqîqat: *Investigation*) hawbeş û dozînewey çareserî giştî hawkat û hawferman (le yek kat û le layen yek destewe) berêwe debirêt.

Sîstemî yek destey berêweberan le kobûnewekanda weha dekat babetekan asantir pêkewe bibistirên û pêşkewtin le karekan xêratir bedî bikirêt.

Grûpkarî - ger mamostayan be şêwey tîm kar biken bo nimûne mamostayanî polî 1-3 pêkewe xerîkî planrêjî û piyadekirdin bin, modêleke debête bestinewey helimetî “berengarîy çepandin” be karî rojaney xoyanewe. Modêlî têkbestiraw peywendîy nêwan encumen û tîmekan desteber dekat.

Dekirêt serokî tîmekan le kobûneweda kat terxan biken bo rûnkirdinewey nawerokî rênimake. Dekirêt babetekanî nawerokî kitêbeke dabeş bikirêt û karî le ser bikirêt, herweha hemû babetêk be wîrdî pêş kobûnewe xwêndirabêtewe. Debêt ber le destpêkî kar, hemû layek be başî şarezay rênimake bin.

Kobûnewekanî tîm dekirêt be dirêjayî sal kar bikat bo plan dariştin û giftûgoy mêtud û çareserî pêşgirtin le nêw polda. Ger her le seretawe, giftûgoy naw kobûnewekan rastewxo bibestirêt be planrêjî kar legal fêrxwazan û xêzanda sûdî zor debêt û zemîne xoş dekirêt bo gorênewey ezimûnî herdû la. Ger beşdarî tîm rûdawî çepandin bibînîn, dekirêt hemû tîmeke le çonîyetî rûdaweke agadar bikenewe û beşdarbûwanîş binasênrên.

Eger nekira rêxistinî mamostayanî fêrge be grûpkarî bêt, bo nimûne leber ewey fêrgeke biçûk bû, dekirêt şêwazêkî dîke wek ewaney le serewe bas kira bekar bihêndirêt.

Grûpî hawkaran - erikî grûpî hawkaran (grûpêk le mamostayan) dariştinî planî kare dij be çepandin bepêy amaje û rêniwênekanî rênimake. Em grûpe şeş car le salî xwêndinda ko debinewe.

Hawkarî - fêrge dekirêt hawkarî layenî dîkey wek derûnnas, dezgey mindalparêz û duktorî fêrge bikat heta hemû layek be dîdarî rastewxoyan legal fêrxwazan û xêzan pitir karîgerî progirameke rahêzin.

Grûpî fêrge - dekirêt rênimay “berengarîy çepandin” 3-5 fêrgey nawçeyek pêkewe bibestît be mebestî harîkarî. Mebest lem kare pêkhanî torêkî harîkarye le nêwan em çend fêrgeyeda. Em harîkarîye pitir be şêwey konkirêt le kobûnewey nêwan encumenî fêrgekanda derbarey berengarîy çepandin pêk dêt. Paş maweyek le cêbecêkirdinî erikeke encumenî em çend fêrgeye detwanin, le kobûnewe û simînarî hawbeşda, ezimûnî hemerengî buwarekanî rênimake bigornewe.

Beşî pêncem

Mêtud û çareser bo fêrge

Qonaxî giwastinewe û destpêkî baş

Qonaxî giwastinewey mindal le zaroxanewe bo pley sereta karêkî girînge. Deşêt giwastinewe le pley jêr bo pley beriztir rolî nayetî legel xoy bigiwêzêtewe. Hawkarîy nêwan berpîrsanî mindal le pley jêr (zaroxane) û pley serewe (sereta) yarmetyekî zor dedat bem core mindalane bo geşey adgarî baştir. Dekirêt qonaxî giwastinewe û çonîyetî têkelkirdinî fêrxwazan yan pêkhatay pol pêş destpêkî fêrge planrêj kirabêt.

Tojîneweyekî gewrey welatî Norwêj, pirînsîpî dananî pêkhatay polekanî 1-7 le çendîn fêrge da be dû şêwaz helsengêndira.

Yekem - “pirînsîpî berdeyamî û pêkewebûn” dananî hemû fêrxwazanî polî 1-7 bepê şiwênî jîyan, bo nimûne hemûyan xelkî gerekêk yan şarekêk bin.

Dûwem - “pirînsîpî bilawe pêkirdin” dananî hemû fêrxwazanî 1-7 le çend fêrgey dîke be pêçewaney pirînsîpî yekem fêrxwazan be kemtirîn rêje xelkî yek gerek bin le polêkda.

Akamî tojînewe lew çend fêrgey “pirînsîpî berdeyamî û pêkewebûn” piyade kird bû rêjey 40-50 % diyardey çepandinî têda pitir bû leçaw ewanî dîkey wa pirînsîpî bilawe pêkirdinî reçaw kird bû.

Pirînsîpî bilawe pêkirdin bepê tîrupîşkî nawî fêrxwazan berêwe deçêt. Belam baştir waye fêrxwazan bepê reçawgirtinî zanyarî zaroxane, fêrge yan mamostay pêşû cêgîr bikirêt. Boye girînge ew fêrxwazaney peywendyan narêke yan karîgerî nayetyan le sere le polêkda nebin, hawkat hewil bideyn nerît û reftarî baş le polda biçespênîn.

Reçawgirtinî berêweberdinî baş pêkhênanî polêke le fêrxwazî baş, ewîş be karameyî û hunerî berêwebirdin dekirêt.

Pirînsîpî bilawe pêkirdin debête hoy danemeziranî pol wek grûp yan desteyek, katêk polî balatir le fêrge yan fêrgeyekî dîke werîdegirêt. Ewkat mamostayan derfetyan pitire debêt bo dananî karyegeryekî baş le ser reftaryan. Betaybet katî destpêk zor girînge, dekirêt fêrge planêkî rûnî hebêt le çonîyetî şêwazî karî mamostayan bo em maweye le polda. Bo hemû polêk mawey dûway pişûy hawîn û destbekarbûnî mamostay niwê le seretawe girînge.

Hêndêk fêrge sîstemî rêkxistinyan bepêy pleye (bo nimûne polî 1-3 pley yekeme û polî 4-7 pley dûweme û polî 8-10 pley sîyeme) nek bepêy pol, belam hawkat plekan grûpbendî kirawin. Em şêwaze derfetî çak dedat be piyadekirdinî pirînsîpî bilawe pêkirdin. Lew fêrgey sîstemî pol bawe, deşêt mamostayan tûşî demeqale û kêşe bin legel xêzanî fêrxwazanî polî yekî seretayî katêk pirînsîpî bilawe pêkirdin piyade deken. Herçend piyadekirdinî em pirînsîpe sûdî zortire, belam dekirêt le katî destpêkda be şêweyekî baş legel xêzanî fêrxwazanda bidûwên û derbarey sûdî em şêwaze qena`etyan pêbênîn. Dena sûdekey le rêgey kêşmekêşî (hawra nebûn û giftûgoy nakam) nêwan mamosta û xêzan be xesar derwat.

Tojînewe Leser Fêrxwazan

Fêrge tojîneweykî bê naw û nîşan le ser fêrxwazan le werzî beharda encam dedat. Forimî tojîneweke birîtye le hêndêk pirsiyarî serekî derbarey çepandin. Mebest lêreda rûpêwî rêjey çepandin û diyarîkirdinî şiwênî rûdawî em kêşeyeye. Hawkat derfetî eweman pêdeda bizanîn rêjey çepandin le temen, pol, ple û nêwan kiç û kurda çi ciyawazyekî heye. Akamî em core tojînewane hemîşe heley têda debêt, behoy welamdaney hele û tenegeyiştinî fêrxwaz le yek yan çend pirsiyarêk. Emey dûwayan pitir le nêwan fêrxwazî kem temenewe rû dedat leçaw fêrxwazanî gewre. Beherhal tojîneweke wêneyekî başî barudoxî kêşeke le fêrge pêşan dedat. Em tojînewe bê nawinîşane pênassey beşdarbûwanî kêşeke diyarî nakat. Rênimake bo nasandinî ew kesane şêwazêkî dîke reçaw dekat ke dûwatir bas dekirêt.

Akamî tojîneweke yek car dexirête ber dest hawkaran paşan encumenî fêrxwazan û niwênerayetî xêzan (dû kes le xêzan niwênerayetî hemû xêzanî fêrxwazan le polêkda deken û debine pirdî peywendî nêwan fêrge û xêzan). Pêwîste niwênerayetî xêzan akamî tojîneweke le yekemîn derfetda le kobûnewey xêzan bixate ber destyan. Pêşkeşkirdinî akameke debête hoy pêdaçûnewey wirttir be mêtud û planî karî berengarîy çepandinda. Planî kobûnewe dekirêt le layen fêrge, encumenî fêrxwazan û destey niwênerayetî xêzanewe be hawkarî dabinrêt. Hawkat em kobûneweye derfetêkî çak derexsênît bo beşdarî pêkirdinî şaredarî şar, beşî saxlemî û karguzarî fêrge.

Lewaneye fêrge akamî tojînewekanî hawkat legel çend fêrgeyekî dîke bo derkewêt ke rênimay berengarîy çepandinyan bekarhênawe. Pêwîste fêrge neçête doxî bergiryewe beranber be rêjey zor, yan şanzî bikat be kemî rêjekewe. Fêrge detwanêt mêdya banghêşt kat bo kobûnewe û hemû beşdaranîş debêt pêştir agadar kirabêtinewe le hatinî. Em babete dekirêt le planrêjî kobûnewe biryarî le ser dirabêt.

Tojîneweke salî dahatû le heman katda dûpat debêtewe û emeş debête binema bo şirovekirdinî karîgerîy berengarbûneweke û şêwazî bekarhênanî rênimake le dahatûda. Paş yekem sal fêrge detwanêt hemû salêk tojînewey weha, wek beşêk le hewilî pêşgirtin le çepandin encam bidat.

Gorepanî fêrge

Diyardey çepandin be zorî le şiwêne giştyekanî fêrge rû dedat û hewilî aşkira karîgerîy başî debêt. Fêrge wek beşdarêk le bernamey berengarîy çepanda debêt hemû şiwênekan be mamostay peroşdar biparêzêt. Herweha şiwênî giştîy dîwî naw û derwey fêrge. Hêndêk şiwên zor car le tojînewekanda dernakewin, wek şiwênî cilgorîn, werzişge û awdest, em şiwênane bo tak şiwênî toqandine û berpirsan debêt çareserêk peyda biken kes le hîç şiwênêkî fêrge bêrêzî pê nekirêt.

Dekirêt grûpî çawdêr le mamostayanî çend pol û ple pêkewe rêkbixirên heta zorbey fêrxwazan le katî çawdêrîda binasin. Debêt mamostayan le katî çawdêrîda tewawî serincî xoyan bixne ser fêrxwazan nek ser yekdî. Nabêt çawdêran pêkewe bigerên, debêt bilawbibinewe heta be başî agayan le hemû layek bêt.

Dekirêt le yekem rojî fêrgewe hemû beyanîyek mamostayek yan dû, fêrxwazan bexêr bihênin û le katî pişûda têbikoşin peywendî legel zortirîn rêjey fêrxwazda bigirin û pêşanî biden ke ewan kontrolyan heye. Ger reftarêkî nayetî yan betaybetî çepandin rûy da, eman be reftarêkî aram û cêgîr deselatî gewreyî xoyan biniwênin.

Katêk çendîn fêrxwaz be kêşeyekewe degilên baştîre waye yek be yek derbarey kêşeke qseyan legel bikirêt nek hemû betêkra. Girînge daway xonasandin le hemû fêrxwazêk bikeyt, ger newîst nawî bilêt, pêy rabigeyne ke to deynasîtewe û naw û nîşanîşî peyda dekeyt.

Bem şêweye û be nore qse legel hemû têwegilawan dekeyn û rêge nadeyn pitir reftarî neşiyaw lexo biniwênin. Debêr rûdawî gewre legel mamostay pol û berêweberî fêrge bas bikirêr. Katêk fêrxwazan debînin to kol nadeyt û bepê rêsa û standardî fêrge le rûdaweke dekolîtewe, xêra hest be akamekey deken û dirêjey pê naden. Boye girînge her le seretay destpêkî fêrgewe fêrxwazan be standard û rêsay fêrge aşina bin pêş ewey bibête hoy wirûjandin û tûrebûnî layenêk.

Çareserêkî biçûk belam karîger le rênimay mamostada heye be leberkirdinî vêt (yeleg - kirasîkî bêqolî rengawreng) bo baş diyarbûn le hewişî fêrge le katî pişûda. Ezimûn kirawe em vêt leberkirdine bo fêrgey bineretî karîgerî zor başî debêr. Katêk payîz le destpêkî fêrge em çareser cêbecê bikirêr, hemû mindalan be aşkira boyan derdekewêr rûberûy şitêkî niwê debinewe. Vêsteke sîmbulî deselat dedat be gewrekan û herweha baştir diyar debin bo fêrxwazan û bo yekdîş.

Berêweberî fêrge

Berêweber detwanêr le yekemîn derfetda serdanî hemû polekan bikat betaybet katêk mamosta le poldaye. Sereray giftûgo legel fêrxwazan û mamostay pol, berêweber pirsîyar derbarey çepandin araste bikat û herweha pêyan rabigeynêr ke dîsan serdanyan dekatewe û betaybetîş derbarey çepandin pirsîyaryan lê dekat. Lem core serdaneda girînge mamosta û berêweber hawdengî xoyan derbarey rêsa û standardî fêrge bixne rû. Em serdanî berêwebere debêr bikirête rotîn nek her le seretay destpêkî fêrge rûbdar. Hawkat pêwste berêweber carûbar le gorepanî fêrge derkewêr û xulay hawkarîy xoy pêşan mamostayan û fêrxwazan bidar. Dekirêr hawkaranî encumenîş wek serperîştyar û pisporanî dîke em rewte bikene nerîtêkî nêw fêrge.

Destey hawkaran

Fêrgey baş berêweberayety başî heye û hemû hawkaran be hend werdegirêr. Hawkarîy mamostayan bende be dostayety û yarmetyewe. Ezimûn pêşanî dawê mamosta zor sûd le rênîwênî dû layene debînin û detwanin ra û boçûnyan le kobûnewe û simînarekanî nêwxoy fêrge bigornewe. Bem şêweye mamostayan piştyan qaym debêr le hember kirdeweyan le nêw pol û hawkaryan legel xêzan û çawdêranî pişûwekan.

Le mawey payîzda grûpî hawkaranî berengarîy be mebestî berpîrsayety û yarmety fêrge le planrêjî û mêtudekanî dij be çepandin dademezrêr. Şirove û karkirdin le ser babetekanî rênîma zor girînge bo em grûpe. Dekirêr le hemû kêşeyekî konkirêr nawî ew fêrxwazaney be çepandinewe gilawin le nêwan endamanî encumen û grûpî hawkaranda aşkira bikirêr, herweha nawî fêrxwazî têwegilaw le rûdawî biçûkîşda û bepê dabeşînî berpîrsayety dîvçûnî bo bikirêr.

Encumenî fêrxwazan

Le rênimay berengarîy çepandinada bepêy pîrînsîp gewrekan biryarder û berpîrsin le pêşgirtin û nehêştinî çepandin. Debê rênîmey rûn hebê bo çonîyety yarmety danî fêrxwazan le prosekeda bo bekarhênanî mêtud û çareserî karîger.

Destey kêşk/ êşk / xefer

Ew fêrxwazaney destey kêşk pêk dênin, detwanin zor besûd bin bo fêrge. Destey kêşk grûpêk le fêrxwazane rastewxo erikiyan pêdespêrdirêt le katî pişû bo hêwrkirdinewe û pêkhênanî jîngeyekî başî nêw fêrge. Hawkat detwanin berpîrs bin le çalakîy derewe û nawewey fêrge. Şaerkî destey kêşk xo derxistine le gorepanî fêrge. Şêwey diyarîkirdinî erikî em desteye û nasandinyan be hemû fêrxwazan û pêdanî nîşanîyek bo katî pişû le gorepan. Em kesane nabêt rolî nêwancî le rûdawî gewreda bibînin, tenha detwanin mamostayan agadar bikenewe. Detwanin le rûdawî biçûk bipîrsinewe û hêwrkirdinewey layenekan bigirne esto. Dekirêt rolî destey kêşk le layen encumen, mamosta û hemû berpîrsanewe diyarî bikirêt.

Destey kêşk dekirêt le çîwar kes bo her pişûyek pêk bêt ke dû dû pêkewe kêşk biden. Begîştî 10-20 fêrxwaz detwanin em erike bigirne esto û roj û katekan lebeynî xoyanda dabeş biken. Buwarî berpîrsayetî desteke debestirêt be beşî encumenî fêrxwazanewe. Beşdaranî deste debêt be nûsirawe daxwazî endametî pêşkeş biken.

Sistemî biragewre

Fêrge detwanêt em sîsteme piyade bikat. Mêtudeke birîtye le pêdanî berpîrsayetîy sinûrdar be fêrxwazî betemen le gorepanî fêrge û katî pişûda. Dekirêt, bo nimûne fêrxwazanî polî no berpîrsayetî polî sê yan polî şeş berpîrsayetî polî yek, yan tak tak bigirne esto. Dabeşînî em berpîrsayetye le layen mamostawe debêt.

Stiratêjî zanyarî

Amirazêkî girîng lem rênimayeda stiratêjyekî tokimey zanyarye hem bo naw hem bo derewey fêrge. Mebestî serekî lem stiratêjye çirkirdinewey cexit û twanay heme layeneye bo encamdanî erikekan.

Berêweber berpîrse le piyadekirdinî rojefî berengarîy çepandin bo hawkaran, fêrxwazan û xêzan be şêwey berdewam. Hebûnî stiratêjî baş gorênewey zanyarye le nêwan grûpekan. Bo nimûne berêweber û cêgirî berêweberî encumenî fêrxwazan zanyarî derbarey karî encumen deden be hawkaranî dîkey em buware le fêrge. Dekirêt fêrge şiwênêkî giştî wek jûrî pişûy hawkaranî hebêt bo helwasînî zanyarî derbarey sêminar, kobûnewe, tojînewey fêrxwazan, û htd... Sereray pêdanî zanyarî xêra. Berêweberî fêrge detwanêt em zanyaryane pêkewe peywest bidat be zanyarî giştî û le katî axawtin bo hawkaranî fêrge û grûpekanî dîkey rabigeyênêt.

Pirînsîpêkî girîng û serekî pêdanî zanyarî be beşekanî nawxo, hawkaran û paşan dereweye. Xêzan grûpêkî zor taybetî em buwaren û debêt le beharda zanyaryan derbarey berengarîy çepandinewe pêbdirêt. Em zanyarye dekirêt hawkat legel xwaznamey fêrge derbarey beşdarbûn yan nebûnî mindal le tojînewey fêrxwazan, be xêzan bidirêt. Katêkî girîngtir bo pêdanî zanyarî be xêzan dûway tewawbûnî tojînewe û rageyandinî akamekeyetî. Dekirêt legel raportî kobûnewey xêzan zanyarî derbarey şêwazî berengarbûnewe û akamî tojînewe û karîgerîy çareserekan be nûsirawe bo hemû layenekan binêrdirêt. Fêrge dekirêt mawe mawe zanyarî puxt derbarey hemû babetekanî berengarîy çepandin bo xêzan binêrdirêt. Em kare sengî programeke pêşan dedat.

Bêguman mêdya wîstî zorî heye bo wergirtinî zanyarî derbarey mêtud û şêwazî berengarîy çepandin. Bo pêdanî zanyarî puxt û sîstematîk pêwîste be parêzewe babetekan bixeyne rû. Be dariştinî qebareyek zanyarî dirust û serincrakêş derbarey babeteke mêdya banghêşt dekirêt, bem şêweye karîgerîy nayetî mêdya be pêçewanewe debête wize bo rênimake. Rolî mêdya detwanêt bibête hoy serinc û beşdarî kesani derwey fêrge be berdewamî.

Planî kar

Em plane girîngtirîn dokîwmênte (belgeye) bo rêkxistinî kar û mêtudekan bepê rênimay berengarîy çepandin le mawey cêbecêkirdin û yarmetî wergirtinî le derwey fêrge (pisporî fêrkarî) û berdewambûnîşî le dahatûda. Eriki grûpî hawkaran dariştinî planî karî berengarbûneweye, encumen pêwîste em plane legel planî xwêndî salaney fêrge rêk bixat, biguncênit û bîkate dokiyomintêkî karî fêrge. Mebest lêreda pêkhênanî nawerokî sîstemêke û hawahengkirdinîyetî bo raperandinî erikî grûpekan le fêrgeda be şêweyek hemû bitwanin planî kar bikene platforimêk bo karekan le mawey salî xwêndinda. Bo salanî dûwatirîş planî karî lem şêweye rotînî baş deçespênêt û firajûtinêkîş le hemû buwarekanda bedî dênêt.

Beşî şeşem

Mêtud û çareser bo astî pol

Mêkanîzimî destpêk le polda

Şaamancî hemû fêrgeyek dekirê birîtî bêt le: Rahênanî berdewamî fêrxwaz bo helgirtinî berpirsayetîy xoy û hevalan. Em rahênane katêk cê degirêt mamosta le yekem destpêkî çalakîy naw polda amaje be pirînsîp û rêsakan bikat û bekaryan bihênêt. Emca wirde wirde bepê pêşmerc û amadeyî fêrxwazan berpirsayetî be tak û grûp bispêrêt.

Yekem kajêr û yekem rojî fêrge le payîzda bo em babete zor girînge. Ew kateye, mamosta derfetî heye bitwanêt makî berêwebirdinî baş le polda biçespênêt û her em rewteye dûwatirîş geşe dekat û debête nimûne. Destpêkî rêkûpêk zor girînge bo pêşgirtin le çepandinîş.

Yekêk le standardekanî em rênimaye bo polekanî 2-10 pêdanî yek kajêre belanîkemewe be mamostay pol le yekem rojî fêrge da. Mamosta be rawêstan le penay dergay pol û bexêrhênanî hemû takêk û tewqekirdin legelyan şiwênî fêrxwaz ke nawî xoy be parçe kaxezêk lê nûsirawe, pêşan dedat. Sereta, fêrxwazan nabêt be grûp dabinîşin.

Paşan mamosta xoy û ew waneyey deylêtewe le yekem kajêrda be pol denasênêt. Bo ragirtinî sengî pol û serincî fêrxwazan, nabê mamosta babet û waney dîke lem kajêrey yekemda binasênêt.

Ewca be şeweyekî sîstematîk wane dest pêdekat. Zor girînge mamosta amadekarî tewawî bo wane, çareser û çalakîyekan kirdibêt. Mamosta debêt pêş tewawbûnî katekey xoy encamgîrî babetekey bikat, dena narûnî û naaramî le polda dirust debêt. Paşan fêrxwazan be aramî poleke becê dehêlin.

Tewawî roj debêt bepê em şewaz û destûre birwat, ger pol pitir le yek mamostay hebû, debêt ewan (mamostayan) pêştir le ser em rewte rêk bikewin. Her mamostayek berpirs bû le dûwa waney roj, dekirêt legel fêrxwazan encamgîrî hemû rojeke bikat û agadaryan bikatewe ke mamostayanî dîke zanyaryan derbarey rojeke pêdawe. Mamosta nabêt dûdil bêt le baskirdinî kemasîy (kemukurtî) babetêk, belam pêwîste şapeyamî ayetî bêt.

Katêk, paş çend hefte, hest dekat pol amadey wergirtinî berpirsayetîe, detwanêt ple be ple çalakîyek yan erikêk destnîşan bikat ke fêrxwazan be grûp û tak berpirsayetî bigirne esto, bo nimûne planî kar, encamdanî proje be grûp û htd... Mamostayanî pol dekirêt hawaheng em şewazî berpirsayetî pêdane berfirewan biken. Babetekan baştirîn amirazin bo giftûgoy diyardey çepandin. Diyarîkirdinî saxtarî grûp debêt legel babetî grûpda biguncêt, dena serkewtû nabêt. Zorgirînge rotîne seretayîyekan derbarey mêkanîzimî kar wek, katî destpêk, tewawbûn û qebarey kar be dirêjayî mawey salî xwêndin rêzî bigîrêt.

Mamostay salar

Berêwebirdinî başî pol xalêkî serekîye bo berengarîy çepandin û dû mebestî girîng lem xalewe serçawe degirin. Yekem: Baş berêwebirdinî pol karîgeryekî başî heye le pêşgirtin be çepandin. Dûwem mamostay baş û salar (*Authoritative*) debête cêmitmaney fêrxwazan û zor asantir detwanêt be diyardey çepandin bizanêt û pêşî pêbigirêt.

Le rênimay berengarîy çepandinda bayexêkî zor dedirêt be karîgerîy başî layenî fêrkarî û komelayetî deselatî mamosta. Pirînsîpekanî salarbûnî mamosta peyweste be peroşîy ew bo fêrxwazan û cexitkirdinewe le prosey fêrbûn û encamekey. Wata mamosta debêt xoy wek berêweber û rêberî ferimî pol bixemilênêt û mafî dûwabiryar bo xoy bê. Salarîy mamosta debête hoy dirustbûnî mitmane û bawer lay fêrxwazan.

Her wek pêştirîş basiman kird em rewte nabêt legel kesayetîy xosepênda têkel bikirêt: Mirovî xosepên û milhur kesêke wîstî xoy be zor beser fêrxwazanda desepênê, kesêkî tirshênere, cêy mitmane nîye lay fêrxwazan.

Le polêkî başda hemû peywendyekan dostanen, rotîn û normekan rûn û ayetîn. Salarîy mamosta yarîderî em amanceye.

Piştîwanî

Mamostay salar bayexî zor dedat be piştîwanîy civakî hemû fêrxwazan. Wata mamosta çawdêr û peroşî hemû takêkî fêrxwaze, wêray ciyawazîy twana, xulya û xesletyan. Fêrxwaz debêt hest be jîngey ayetîy pol û peroşîy mamosta beranber be xoy bikat û bizanêt mamosta xem û şadî ew behend werdegirêt. Em behend wergirtine serincî fêrxwaz radekîşêt û mitmaney pêdebexşêt. Mamostay salar rêzî xoy pêşanî fêrxwaz dedat, tenanet katî rastkirdinewey heleş.

Mamostay zîrek dezanêt hemû core peywendyek legel fêrxwazanda girînge û sengî xoy heye. Mamosta dezanêt zorbey em peywendyane lepir pêk dêt û ew kat debêt derfet le kîs nedat bo cêgîrkirdinî peywendî baş. Sereray emeş mamostay zîrek be bername destpêşxerî dekat, bo nimûne amaje be salrojî ledayikbûnî fêrxwazan dekat.

Pêdaheldan wizebexşe. Hemû fêrxwazan, katêk bepêy standard û rêsa reftar deken, debêt xelatî zarekî bikirên. Rênimay berengarîy çepandin em buware zor beriz denirxênêt. Fêrxwaz le polda bê yan na, mamostay salar be rêzewe nawî dênêt. Em rewte lay hevalan, hawkaran û xêzanîş debêt herwa bê.

Wek rewte le rênimay berengarîy çepandinda dekirêt her fêrxwazêk twanay nûsînî heye, defterî yaddaşî hebêt. Lem deftereda arezû û dawakarî xoy le mamosta dexwazêt, mamostaş têbînî xoy denûsêt û dîvçûn bo peyamî girîng dekat.

Piştîwanî fêrkarî û rêkxistin

Fêrgey baş gişt sûdêkî fêrkarî reçaw degirin û em reçawgirtineş akamî civakî başî lêdezêt. Mamostay salar rêsa û rênimay rûn bo karkirdin le polda daderêjin, eme debête hoy yeknewazî pêşweçûnî erik lay fêrxwazan. Mamostay zîrek pêş wane xo teyar dekat û fêrxwazîş naçar debêt peyrewî plan bê. Wanekan le katî xoyda destpêdekat û serincî fêrxwazan radekêşêt. Fêrxwazan dezanin çi dawakarîyek rûberûyan debêtewe û çon debêt erikiyan encam biden. Wanekan nabêt be şeweyekî bê kontrol tewaw bin, bepêçewanewe debêt zor aram û rêkûpêk kota bin. Rêkxistinî pol yan grûp debêt baş bê û mamostaş serçaweyekî fêrkarîy rûn bê bo fêrxwazanî.

Kontrolkirdin

Mamostay salar dawakarî le fêrxwazan diyare, eme xoy nîşaney handanî ewe bo cêbecêkirdinî erik, çawdêrî prose û akamî fêrkarî dekat û bepê pêwîst têbînî dedatewe fêrxwaz.

Fêrxwazan dezanin mamosta reftaryanî xistwete jêr çawdêrî û detwanêt her kat bîhewît naaramî û jawejawî naw pol dabimirkênêt. Mamostay salar zorbey car rûy demî le takî fêrxwazane, nek hemû fêrxwazan be carêk. Mamosta peyamî aşkira û rûne derbarey her kemasîyek. Em peyamane zor car tenya be nîga yan amajeyek arastey fêrxwaz dekirên. Peyameke gurec û kurte heta rewî karî pol têk nedat. Peyameke hem rûne bo fêrxwaz û hem rêzîşî degirêt.

Jîngey pol

Mamostay salar rastewxo yarmetî kemkirdinewey çepandin û narastewxo jîngey pol baştir dekat. Karîgerîy (narastewxo) birîtye le beşdarbûnî pol le çalakî fêrge û katî pişûgirtin le gorepanî fêrge û firewanbûnî em jînge başey pol le şiwênekanî dîke.

Peywendî nêwan fêrxwazan layenêkî girîngî em jîngeye, katêk mamosta peywendî başî legel hemû takî fêrxwaz hebû debête handerêk bo dirustbûnî heman rewte le nêwan fêrxwazanda. Rêkxistinî çak û yarmetî fêrkarîş hokarî dîken bo başbûnî jîngey pol. Katêk fêrxwazan hest be twana, hawahengî û hawkarî le karda deken, pitir hogirî yekdî debin û çêjî baştir le rahênan werdegirin. Hawkat peywendî nêwanyan aramtir debêt û waz le pêşbirkê xo derxistin dênin. Xalêkî le hemwan girîngtîre: Peywendî nêwan fêrxwaz û mamosta nakewête jêr karîgerîy nayetyewe - dengedeng û bolebol û welamî narêk. Rotînî diyar û çak pêşmercî jîngey başî kar û keşî dostaney lê dezêt ke hem mamosta hem fêrxwaz sûdî lê debînin. Hawkat twanay kontrol û zalbûnî mamosta karîger debêt le baştirbûnî jîngey pol. Katêk fêrxwaz hest dekat mamosta le polda salare, asûde debêt û her emeş debête hoy aşkirabûnî norm û standardî fêrge.

Peywendîy nêwan fêrxwazan, şewazî çêj wergirtinyan le twanay fêrkarî û normekanî civat amirazî serekîn bo pêkhênanî jîngeyekî baş le pol û bêguman rolî mamostay salar detwanêt em rewte pere pêbdar.

Kirdarî çepêner dij be çepênirawan wizeyekî nayetye. Berengarî û dilerawkêy kesî çepêniraw berteke (kardanewey), belam be zorî em berteke lawaze. Wizey sêyem fêrxwazanî dîken û em wizeye zor girînge. Wizey sêyem detwanêt be şewey nayetî dijî çepênirawan le polda bekar bêt û jîngeyekî nayetî le polda pêk bînêt.

Lew polaney rênimayekanî mamosta peyrew dekirêt jîngey baş deçespêt û wizey sêyem detwanêt bibête wizeyekî behêzî parastin bo kesanî çepêniraw yan berçepên (ewaney dekwine sinûrî çepandinewe).

Be rêjeyekî zor lew polaney jîngey baş bawe fêrxwazanî “bêlayan” destpêşxer debin le daldey kesanî çepêniraw yan berçepên. Legel emeşda fêrxwazanî bêlayan detwanin sinûrêk dabinên bo çepêner. Herweha rêberayetîy salar û jîngey baş derfetî baş dedat be mamosta begîştî bo selimandinî mebestî xoy lay fêrxwazanî bêlayan û debête handerêk bo weestogirtinî berpirsayetîy naferimîy heval - betaybetî ger diyardey çepandyan berçaw kewêt. Ger temaşaçyan helwêst pêşan biden karîgerîy zor debêt.

Pêşgirtin le çepandin

Le zorbey planî karî dijî çepandinda, mêtudî pêşgirtin zor girîngî pêdedirêt. Kobûnewey pol, kempîn, (rojane yan heftaney taybet be dijî çepandin) nûsirawe, diruşim û rêniwênî detwanêt bibête hêz befirodan, ger ew normaney darêjrawin legel koy standardî daniraw bo reftarî rojaney fêrxwaz yeknegirnewe. Ême dîsan pêgîrîn lewey hewilî rojane û têkoşanî dirêjimewda xoy le xoyda girînge û standardî lem babete baştirîn binemaye bo wirûjandin û lêkdanewey pirsiyar betaybetî derbarey çepandin. Rênimay berengarîy çepandin piştiraste bem core amiraz û mêtudaney pêşgirtin le çepandin.

Fêrgey beşdar le progiramî berengarîy çepandinda debêt babetî çepandin le polda be şewey berdewam bixate berbas. Pêwîst nakat katêkî zor bekarbihênîn, belam fêrxwazan debêt bizanin mamostakanyan heftane babetî çepandin dewrûjênin. Em base dekirêt katêkî taybetî bo terxan bikirêt, wek beşêk le babet û karî rojaney pol yan peywend bidirêt be babetî xwêndinewe. Bo wirdekarîy biniware birgey yekrewtî.

Çareserî xorisk

Le doxî asayî fêrkarîda zorcar derfet heldekewêt bo pêşgirtin be çepandin, babetî xwêndin, yan serheldanî rûdawî civakî, xoy detwanêt derwazeyek bêt bo banghêştî mamostay wirya. Bêguman kes nabêt fêrxwazan be witar û rûnkirdinewey lem babete bêzar bikat. Merc lêreda agadarkirdinewey fêrxwaze le çepandin û peyrewîkirdine le standardî ayetî ke mamosta peroşyetî. Bem şewe mamosta kelk le rûdaw û babetî xwêndin werdegirêt û nêwerokî standardî fêrge pêşan dedat.

Mêtudî têkbestiraw

Lêreda mebestiman peywendîy planrêjkirawe derbarey çepandin ke girêdirawe be babetî xwêndin û çalakî rojanewe. Bo nimûne têkstêk le waney zimanî kurdîda rastewxo yan (narastewxo) basî çepandin dekat. Têkstgelêk derbarey rewîşt û reftar le waney ayînda zor lebarin. Ewca derfetî dîkeş heye, wek fîlim, vîdîw û htd... Heye.

Dekirêt fêrxwazan han bidirên bo nûsînî têkst derbarey çepandin û amirazekanî peywest bem diyardeye. Ezimûn pêşanî dawe nûsîneke xoy le xoyda debête derfetêkî niwê bo derik û agadarbûnewey nûser le babetî nûsîn. Paşan derfet bo mamosta deguncêt bo derbirînî serinc û têbînî le perawêz yan kotayî têkstekeda û karîgerîy pitirî le ser dadenêt. Derfetêkî dîke rêkewtine legel fêrxwaz û xwêndinewey babetekey bo poleke, ger fêrxwaz pêxoş bêt dekirêt xoy têksteke bixwênîtewe. Her dû şewaz fêrxwaz debestêtewe bew babetey nûsîwye û detwanêt karîgerîş le ser ewanî dîke dabinêt. Girînge pêş helbijardinî fêrxwaz be wirdî bîrî lêbikeynewe kê başe bo em kare.

Mêtudekanî serewe dekirêt pêkewe peywest bidirêt. Mamosta detwanêt be têkst, fîlim yan amirazî dîke... Fêrxwazan han bidat bo nûsînî têkst be tak yan begrûp, paşan dekirêt bo poleke bixwêndirêtewe. Detwanrêt heman şewazî pêştir yan be şewey dirama û rolgêran bekar bêt.

“Kotay hefte”

Le sîstemî derûnnasîda pitir girîngî dedirêt be karîgerîy ayetî kotay karî tak yan grûp. Betaybetî em karîgerîye katêk baş debêt ke rêberî ferimî grûp bunyadinêr û çalak bêt. Her boye le progiramî berengarîy çepandinda rotînêk heye ke mamosta têyda, dûwa kajêrî hefte legel fêrxwazan bo

babetêkî ayetî terxan dekat nêzîkey 10-15 xulek dexayenêt, be nawî “kotay hefte” û bew bernameye malawayî le fêrxwazan dekat.

Xalî serekî lêreda eweye fêrxwazan bizanin em nerête hemû hefteyek dûbare debêtewe û amaje be çepandinîş dekirêt. Hawkat girînge mamostay pol her be babetî çepandin hizirî fêrxwaz dagîr nekat belkû bîbestêt be babetî gewretirewe. Dekirêt yek xulek pitirî pêwe xerîk nebêt û carî dîkeş detwanît biçête qûlayî basekewe. Mamosta detwanêt riwangey xoy derbarey çepandin bo poleke bixate rû. Bo nimûne: “min em hefteye nembîstwe û nembînîwe kesêk azar dirabêt, çepêndirabêt, tenanet mamostayanî dîkeş têbînyan nekirdue”. Hemîşe le kotayîda pirsiyar bike bizane kesêk şitêkî heye bo baskirdin. Ger hebû ya ewkat ya dûwatir bedûwayda biço û lêybikolewe.

Pêşekîy baş bo em serinc dane be babetî çepandin, encamgîrî kotay karî hefteye, hêndêk sitayşî fêrxwazan yan poleke bike, wek aferîn û destxoşî. Dekirêt kotay baskeş be babetêkî dîke tewaw bibêt.

Giftûgoy fêrxwaz

Amirazêkî girîng le progiramî berengarîy çepandinda, giftûgoyekî wirdî mamostaye legel hemû takêkî fêrxwaz maweyekî kurt paş destpêkî fêrge. Em pirsiyaraney xwarewe arastey fêrxwaz dekirêt û xêzan debêt agadarî nêwerokî giftûgoke bin, dûwatir birwane birgey kobûnewî xêzan:

- Erikî fêrget çone?
- Xoşt lêdeguzerêt le fêrge?
- Kes heye azart bidat û bitçepênê?
- To fêrxwazêk denasî be çepandinewe gilabêt?
- Bo xot azarî fêrxwazî dîke dedeyt?

Karîgerîy zor debêt katêk mamosta pirsiyarekanî le laperyekda le pêş xoy danawe û nawenawe yadaşt heldegirêt, paşan mamosta û fêrxwaz lapereke wajû deken û mamosta le pêş çawî fêrxwaz deyxate bergêkewe û helîdegirêt.

Bepê pirsiyarekanî mamosta derbarey çepandin, fêrxwaz têdegat mamosta agadarî babete û fêrxwazanîş le nêw xoyanda basî deken. Her eme karîgerîy pêşgirtinî zore. Ger fêrxwaz zanyarî derbarî çepandin bidat, debêt mamosta bîselimênêt û destxoşî lêbikat bo kirawayî derbarey babeteke. Paşan debêt xêra dîvçûnî bo bikirêt.

Giftûgoy fêrxwaz dîsan carêkî dîke le mangî sê û çiwaz dûpat debêtewe.

Pirînsîpekan

Amirazî çareserkirdinî çepandin detwanêt karîgeriyekî başî hebêt, ger fêrge pirînsîpekanî biçespênêt. Pêş hemû şitêk debêt mamostayan hawkarîyekî başî yekdî biken le gorepanî fêrge, le pol û derbarey standardî giştî fêrge ke mercî serekîye bo cêgirkirdinî amirazî çareserekanî çepandin. Dûwatir debêt çemikî baskirdin derbarey çepandin xorisk bêt û bibête beşêkî asayî prosey xwêndin û fêrkarî.

Paşan dêyne ser: Kate diyarîkirawekan, giftûgo legel fêrxwazan, “kotay hefte” ew amirazanen ke rotîn bo tewawî mawey salî xwêndin diyarî deken.

Têkbestinewey em amirazane asûdeyî be fêrxwazan dedat û debête ferheng bo fêrge. Heta êsta neselimênirawe heftey kempîn û amirazî lem babete be tenya karîgerîy debêt.

Kobûnewey xêzanî pol

Mamosta debêt kobûnewey xêzan bo polî 1 û 8 y salî dahatû le kotay emsalî xwêndinda bigirêt (polî yek leber qonaxî destpêke le fêrge û polî heşt leber qonaxî seretay lawye). Girtinî kobûnewey xêzan pêş destpêkî fêrge derfetî çak dedat be mamosta bo dananî karîgerîy ayetî û standardêkî baş. Zor girînge mamosta be rûyekî xoş û geşewe dîdaryan legel bikat û sûdî zor debêt ger bizanêt kên û mindalekeyan kêye.

Kobûnewey polekanî dîke çend hefte dûway destpêkî fêrge û pêş giftûgoy fêrxwaz û mamosta le payîzda dest pêdekat.

Dekirêt bawik û dayikan le grûpî 4-6 kesî le ser mêzêk danîşin. Kobûnewe be xo nasandinî beşdarbûwan dest pêdekat, sereta mamostay pol be şêweyekî kurt û puxte basî planî çend heftey sereta dekat û amaje be pirînsîpe giştîyekanî fêrge û girîngiyar dedat. Pêwîste lêreşda basî deskewtî fêrxwazan le xwêndin, asûdeyî û xoşguzeranyan le jîngey fêrge bikirêt.

Paşan rênimay berengarîy çepandin pêşkeş dekirêt, mamosta lêreda amaje be tojînewey fêrxwazan dekat ke beharî raburdû encamdira û radegeynêt her katêk encamekey amade kira dexirête berdestyan. Dûwatir dekirêt filimêk derbarey çepandin pêşan bidirêt.

Ewca mamosta be wîrdî basî çepandin û rêjekey le civatda dekat û pirînsîpe serkîyekanî programeke bo beşdarbûwan rûn dekatewe. Çak waye sereta girîngî bidirêt be amirazî pêşgirtin dûwatir basî giftûgoy nêwan fêrxwaz û mamosta be nêwerokewe bikirêt. Hawkat detwanrêt zanyarî derbarey çonîyetî hewilî fêrge legel diyardey çepandin bepê rênimay mamosta be xêzan bidirêt.

Êsta katî pişûdan û xwardinewî ça û qawe hatwe, bêguman lem kateda bawik û dayikan basî mêtud û çareserekanî pertûkî berengarîy çepandin deken. Boye pêwîste be arastey çend pirsiyarêk û giftûgokirdinî le nêw grûpda sûd lem derfete werbigirîn. Grûpekan paş giftûgo û rîkewtin le ser çonîyetî welamekan yek axêwer destnîşan deken bo welamdanewe, emca mamosta daway welamî grûpekan dekat derbarey em sê pirsiyarey xwarewe.

- Dekirêt fêrxwaz her şitêk derbarey çepandin bizanêt bo xêzan û mamostay bas bikat?
- Çon le malewe basî çepandin legel mindalekaniman bikeyn?
- Êmey xêzan çon detwanî hawkarî yekdî bîn ger mindalekaniman be çepandinewe gilan?

Mamosta dawa le axêwerî grûpekan dekat her yek be nore dîdî grûpekeyan pêşkeş biken. Dûwatir mamosta be kurtî basî şêwazî berengarbûnewey fêrge dekat, ger çepandin têyda rûbdad. Sereray emeş mamosta beşdarbûwan han dedat bo pêdanî zanyarî derbarey nêwerokî kobûneweke û ew biryaney lewê derçûn be mindalekanyan biden.

Kobûnewe be axawtinî mamosta derbarey dîvçûnî babeteke le rêgey giftûgoy dûqolî û kobûnewey pol berdewam debêt. Mamosta erikî nûsînewey raportî kobûnewe degirête esto û paşan bo hemû xêzanî denêrêt. Zor girîng debêt mamosta be aşkira peroşî xoy bo nehêştinî diyardey çepandin pêşan bidat.

Rojî dûwatir mamosta hemû fêrxwazan le nêwerok û encamî kobûnewey xêzanî pol agadar dekatewe.

Le kobûnewekanî dahatûy xêzanî polda debêt babetî çepandin hemîşe le rojefî kobûneweda bêt, belam ba yekêk le çend babet bêt. Hawkat zor pêwîste sengêkî zor be babeteke bidirêt, belam ba be şêweyekî siruştî têkel be babetêkî gewretir bikirêt. “xêzanî pol” (dû niwênerî xêzanin ke dilxwaz berpîrsayetî peywendî nêwan xêzan û pol degirne esto) be giştî hêndêk berpîrsayetyan le nêwerokî kobûnewekan pêdedirêt û dekirêt rolêkî berçaw le çespandinî rotînekan le nêwan fêrge û xêzanda bigêrin.

Kobûnewey dûqolî

Mamosta debêt wek rotîn basî çepandin le hemû kobûnewe dûqolyekanî nêwan xoy û xêzanda bikat. Eme nîşaneyekî girînge ke pêşan dedat mamosta û fêrge peroşî em babeten, herweha derfetîş dedat be xêzan bo baskirdinî hêndêk kêşe ke pêştir baskirdinî sext bûwe boyan.

Ger xêzan hest biken rûdawî çepandin heye, debêt mamosta kêşeke behend bigirêt û bê dûwaxistin lêkolînewey bo bikat. Mamosta detwanêt giwê bigirêt lew zanyaryey xêzan deyden û pîrsiyarî rûnkereweş arasteyan bikat. Mamosta nabêt hiç core zanyarî û hêlsengandinêk derbarey fêrxwaz yan xêzanêkî dîke be layenî giftûgo bidat.

Giftûgo derbarey çareserey nehêştinî çepandine û bepêy heman pîrînsîp derwat ke le pol û le kobûnewey xêzanî pol reçaw degîrêt. Babeteke hemîşe bas dekirêt, belam le çêweyekî berfirewantirda. Her boye debêt kobûnewe dûqolyekan beşêweyekî siruştî û serekî basî babetgelêkî dîkeş bikat. Yekemîn kobûnewey dûqolî nêwan xêzan û mamosta dekirêt le seretay payîzda bêt. Bo xêzan girîng debêt ger bilêyn diyardey çepandin le kobûnewe dahatûşda bas dekirêt. Fêrxwaz detwanît beşdar bêt le kobûneweda, herweha dekirêt tenya bo giftûgoy nêwan gewrekan bêt.

Beşî heftem

Çareserkirdinî kêşe

Çepandin milimilanê nêwan dû kes ya dû grûp nîye, çepandin destdirêjîye. Her boye nabêt rûdawî çepandin be nawbijî û pêkhênan çare bikirêt. Zor girînge bo ew kesey berengarî çepandin debêtewe rêzî hebêt lay her dû layen. Lem rênimayeda pêdagirî dekirêt leser ewey mamosta kêşeke çareser bikat, belam le doxî alozda dekirêt takêkî encumen berêwebirdinî em erike bigirête esto.

Rêkxistinî giftûgokan bem şêwazey xwarewe berêwe deçêt:

- Giftûgo legel çepêniraw
- Giftûgo legel çepêner û be şêwey takekesî
- Giftûgo legel hemû çepêneran be grûp

Bem şêweye giftûgo legel her dû la dekirêt û le kotada layenekan ko debinewe. Paşan xêzanîş be şêweyekî taybet beşdarî baseke debêt.

Şêwazî rûdawekan ciyawazin her boye debêt zîrek bîn le rêkxistin û rîzbendî giftûgoyekan û çonîyetî pêkgeyandinî layenekan. Lem rênimayeda mêtud û çareser be nimûne hênirawetewe bo çonîyetî berêwebirdinî rûdawî corawcor ke dûwatir pêyan degeyn. Pirînsîpî serekî le giftûgoy fêrxwazda piştîwanîkirdinî kesî çepênirawe û dawakarîye le kesanî çepêner be bê saziş û danûstan.

Hewildan legel kesî çepêniraw

Giftûgoy dûqolî legel çepêniraw

Pêş hemû şitêk mamosta giftûgoyek legel kesî çepêniraw saz dekat û giftûgokeş dekirêt be çendîn şêwaz dest pêbikat. Car heye kesî çepêniraw bo xoy basî azardaneke bo mamosta dekat. Carîş heye xêzanî fêrxwaz em kare deken. Carî waş heye rûdaweke le layen heval yan kargêrêkî fêrge radegeyênrêt, yan mamosta bo xoy be ser rûdawekeda dekwêt.

Mamosta debêt wirdbînane wadey giftûgoyek legel çepêniraw dabinêt, em wadeyeş debêt zor nêzîk bêt le katî danîştineke, bo nimûne le pişûy nêwan wane û pêş giftûgoyeke. Pêwîst nakat bilêyt danîştineke bo çîye. Mamosta û fêrxwaz be tenya le jûrêk giftûgo deken.

Giftûgo nabêt şêwazî lêpîrsînewey hebêt, bo nimûne çonit lêdeguzerêt le fêrge û çî kêşet heye!... Eme debête hoy tirs û şerimkirdinî zorbey çepênirawan ke nawêrin beserhatekeyan rûn bikenewe û bîselimênin.

Sereta mamosta bo fêrxwazî bas dekat ke hoy giftûgoke azardanî ewe le layen kesanî dîkewe. Debêt mamosta bem şêweye bo xoy basî kêşeke bikat û fêrxwaz nexate jêr fişarewe. Zor girînge pêş danîştineke zanyarî pêwîstî derbarey rûdaweke bedest hênabêt, heta pêwîst be lêpîrsînewey fêrxwaz nekat.

Xalî girîng lem danîştineda eweye fêrxwaz hest bikat ke mamosta piştîwanî ewe. Debêt mamosta be raşkawane bilêt ke ew be hîç şeweyek çepandin naselimênêt û be hemû twanayewe berpirsayetî degirête esto heta kotayî pêdênêt.

Em qsanê asûdeyî dedat be fêrxwaz, belam ew pêwîstî beweye bizanêt dûwatir çî rû dedat. Zorbey çepênirawan tirsyan le kardanewey çepênere katêk mamosta derbarey kêşeke deyanxate jêr pirsiyar û lêkolînewe. Lêreda girînge mamosta wird bêt le pêdanî zanyarî be corêk derfet nedat be kesî çepêniraw bikewête dilerawkê û tirsî pitir daybigirêt. Debêt le danîştinda bigutirêt ke kesanî çepêner heta ewkat peywendyan pêwe negîrawe û pêş peywendîgirtin legelyan ew agadar dekirêtewe. Hawkat debêt mamosta katêkî dîke diyarî bikat bo dîvçûnî doxeke û rûnkirdinewey pitir.

Nabêt katî nêwan giftûgoy yekem û dîvçûn zor bêt. Lêreşda peywendî be rûdawewe heye, ger rûdaweke gewre bêt û fêrxwazî çepêniraw le jêr fişarda bêt, dekirêt katî danîştinî dûhem kemtir le yek hefte bêt. Paşan debêt çepêniraw agadar bikirêtewe ke fêrge peywendî be xêzanîyewe dekat, ger heta ew kat em peywendye negîrabêt.

Debêt begîştî be kesî çepêniraw rabigeyêndirêt ke pêş encamdanî her karêk ew agadar dekirêtewe. Hawkat nabêt derfetî pêbdeyn biryar bidat yan dûdil bêt le hewil û çareserekan. Xalî serekî lêreda naberpirsayetîy kesî çepênirawe le proseke, destberkirdinî asayîşî fêrxwaz û pêdanî zanyarî derbarey hewilekan xalêkî dîkey em danîştinen.

Erikî mamostaye her le seretay giftûgowe be fêrxwaz rabigeyênêt ke ew agadare le hemû rûdaweke, belam debêt le mawey danîştineke da giwê bidate her qseyek fêrxwaz bo xoy bihewêt bîkat derbarey rûdaweke yan doxî xoy be bê fişar bo hênan. Hêndêk kesî çepêniraw le tirsî kardanewey çepêner nawêrin hemû şitêk bas biken, belam bem haleşewe çend şitêk her bas deken, çon wa hest deken em kese peroşyetî û deyhewêt yarmetî bidat. Lem doxeda debêt mamosta giwêgirî baş bêt, le fêrxwaz têbigat û pirsiyarî rûnkerewe bo derxistinî rastyekan arastey fêrxwaz bikat.

Mirov nabêt basî nayetîy çepêner wek tak bikat, reftarî ewan nayetîye nek xoyan wek takekes. Lêreda detwanîn çend xalêk rîz bikeyn bo yekem danîştin legel fêrxwaz û nêwerokî giftûgo:

- Rûnkirdinewey doxeke bo fêrxwaz
- Piştîwanîkirdinî
- Pêdanî belên bo agadarkirdinewey le hemû zanyarîyek derbarey rûdaweke
- Diyarîkirdinî kat bo dîvçûn

Xêzanî çepênirawan

Nimûneyekî baw, be zorî le seretawe rû dedat ke xêzanî fêrxwazî çepêniraw peywendî be fêrgewe degirin û radegeyênin ke mindalekeyan deçepêndirêt. Fêrge debêt le barî wehada hemû hewalêkî lem babete behend bigirêt û bê dûwaxistin lêpîrsînewe le kesanî têwegilaw û rûdaweke bikat. Nimûneyekî dîke aşkirakirdinî rûdawe le layen fêrgewe. Şewazêkî asayî kirdar niwandin cêbecêkirdinî giftûgoye legel fêrxwazî çepêndiraw wek seretay kar û peywendîgirtin legel xêzanî le heman rojdaye.

Sereray şewazî destpêkî giftûgo debêt têbigeyn ke em xêzanane le barudoxêkî sextdan. Zorcar detwanin hawkarêkî başî fêrge bin, belam dekirêt çawerwan bîn fêrge be kem terxem û bêdeselat tawanbar biken, yan dawakarî kardaneweyekî tund le fêrge deken beranber be azarderan û xêzanyan. Debêt bizanîn em core dawakarî û reftareş asayîye bo xêzan le doxî wada. Carî waş heye

xêzanî fêrxwazan dawa le fêrge deken bo çareserkirdinî xêray kêşeke, dena bo xoyan kêşeke çareser deken.

Debêt be wîrdî û rêzewe giwê le xêzan bigirîn û dilnyayan bikeyn ke fêrge kêşeke çareser dekat û le şêwaz û çonîyetî çaresereke agadaryan bikeyn.

Le şêwazî destpêkda girînge be xêzan biselimênîn ke fêrge hemû berpirsayetî çareserkirdinî kêşeke degirête esto. Ger fêrge û xêzan heryek rojefî xoyan hebêt û pêkneyen, kêşeke nek her çareser nakirêt, belkû aloztirîş debêt. Eger mamosta dûdil bu le dananî şêwazî çareser yan neselimandinî le layen xêzanewe, detwanêt daway giftûgoyekî dîke le çend rojî dahatûda bikat. Lem maweyeda mamosta detwanêt be yarmetî hawkaranî planêkî guncaw bo çareserkirdinî kêşeke dabirêjêt.

Giftûgo û çawdêrî fêrxwazî çepêniraw

Peywendî û çawdêryekî ptew pêwîste bo kesî çepêniraw û ew wek palpiştyekî girîng deyxemilênêt. Be reçawgirtinî hestî fêrxwaz le katî giftûgoda detwanînin gelêk zanyarî besûd bo çareserkirdinî kêşe be dest bihênîn.

Le mawey çawdêrî û giftûgoda mirov detwanê hewil bidat zanyarî giştî derbarey fêrxwaz û jîngey fêrxwaz ko bikatewe. Betaybetî ger kesî çawdêrî fêrxwaz mamostay nebêt, pêwîste bizanêt le çi polêke, hevalekanî kên, nawî ew kesaney azarî deden, nawî kesayetî berçaw le polda û wesfî doxekanî çepandin.

Hêndê car besûd debêt ger ew pirsîyaney arastey kesî çepêniraw dekirêt derbarey reftar û kirdarîy le pêş rûdaw, katî rûdaw û paş rûdaweke bêt. Leber ewe kesî çepêniraw katêk derbarey xoy zanyarî dedat kemtir hest be tirs dekat, heta derbarey çepêner. Bem şêweye zanyarîyekî wîrd derbarey rûdaweke, katî rûdanî, şiwênî rûdaw û çepêner dexate rû. Hawkat girînge bepê em zanyaryey bedestiman hênawe (barudoxî çepêniraw û kardanewey) helsengênîn û bizanîn heta çi radeyek debête hander bo kesanî çepêner û berdewambûnî doxeke. Bo nimûne her kardaneweyek debête hander bo çepêner dekirêt legel kesî çepênirawda giftûgoy Leser bikirêt û serincî pêbdirêt. Em serincrakêşaneş debêt be corîk bêt fêrxwazî çepêniraw hest be tawanbarîy xoy nekat.

Carîş heye dekirêt be amancewe kar bikirêt le ser kardanewey fêrxwazî çepêniraw le katî rûdanî çepandinda. Bem şêweye hawkarîy kesî çepêniraw dedeyn bo amadekarî pêşkat. Bo nimûne giftûgo û çawdêrî fêrxwaz detwanê birîtî bêt lem core zanyaryane. Bo mamosta girînge bizanêt kesêkî dîke heye yarmetî û piştîwanî fêrxwazî çepêniraw bidat wek, hevalêk, hevalanêk ya legel bawik û dayikî em kêşey bas kirdûwe.

Pirînsîpî yekem lêrda agadarkirdinewey xêzanî fêrxwaze derbarey kêşeke û çonîyetî çareserkirdine le layen fêrgewe. Xêzan heta çi radeyek hawkar bê û rêjey çalakiyan çende bêt, dekirêt bepê rûdaw helsengêndirêt. Temenî fêrxwaz û taybetmendyekanî rûdawke girîngin bo diyarîkirdinî çareser.

Beşêweyekî asayî 2-3 danîştin legel kesî çepêniraw bese, pêş ewey mamosta yan kesî berpirs peywendî legel çepêner degirêt. Wek baskira debêt çepêniraw pêştir agadar bikirêtewe derbarey giftûgokirdin legel çepêner. Ewkat debêt pê rabigeyênîn çi katêk û legel kê qse dekirêt. Herweha xêzanî çepênerîş agadar dekirênewe. Emeş wek xalêkî ayetî lay çepêniraw bas dekirêt. Paş giftûgo legel çepênerîş peywendî û çawdêrî kesî çepêniraw her berdewam debît.

Çareser bo çepêner

Zanyarî wird derbarey rûdaw pêwste pêş ewey mirov peywendî legel çepêner bigirêt. Hêndêk zanyarî le fêrxwazî çepêniraw werdegirîn, paşanîş detwanîn be xistine jêr çawdêrî çepêner le gorepanî fêrge û şiwênî dîke... Zanyarî pitirman destkewêt.

Zor pêwîste giftûgoy takekesî legel çepêner encam bidirêt. Wek pêştir basiman kird serbe grûp bûn yekêk le wize hander û serekîyekanî diyardey çepandine. Katêk fêrxwaz xoy be grûpêkewe debestêt grûpeke behêztir dekat, ca em grûpe kirdarî ayetî bêt yan nayetî. Giftûgoy takekesî legel çepêndiran peywendî nêwan endamanî grûpeke lawaz dekat û grûpbandî heldeweşênêtewe. Dûwatir dekirêt em peywendye be reftarî ayetî wek normî bineretî bunyad binrêtewe. Ger jimarey çepêneran zor bû, debêt danîştinekan le maweyekî kurtda tewaw bêt û nabêt derfetî qsekirdinyan legel yekdî pêbdîrêt heta mamosta kobûnewe dûqolyekanî legel hemûyan kotayî pê dênêt. Debêt giftûgoy tak û grûpî çepêner têkra le maweyekî kurtî yek yan dû kajêrîy kota bêt le katêkda mamostayekî dîke serpereştî poleke dekat. Ger çepêner tenha yek kes bû giftûgo bepê pirînsîpî pêşû berêwe deçêt.

Giftûgoy takekesî (dûqolî) legel çepêner

Paş rêkkewtin legel hawkarda, mamostay berpîrs bem erike le katî waneda deçête nêw pol û banghêştî çepêner dekat. Mamosta û fêrxwazî çepêner pêkewe le jûrêk dest be giftûgo deken, mamosta nabêt le seretada biçête qûlay baseke, kêşeke nabêt yekser bas bikirêt. Ger fêrxwaz pirsyarî kird, mamosta pêdelêt heta çend xulekêkî dîke agadarî dekat hoy bangkirdinî çîye.

Serrêçkey baseke be dest mamostaweye û paş helsengandinî barudox bem pirsiyare çepêner agadar dekatewe, to dezanît maweyeke Aram deçepêndirêt: “min wîstim derbarey Aram qset legelda bikem, maweyeke azarêkî zor dedirêt û toş beşdarî lem azardaneyda”.

Nabêt bas le rast ya narastbûnî kêşeke bikirêt. Mamosta be belgewe qse dekat û belgekeş binemay giftûgoye, belam dekirêt derfet bidat be fêrxwaz qsey xoy bikat. Sûdî pitire ger mamosta be şêweyekî dabir belam mîhrebana legel fêrxwazda bidûwêt. Bem şêweye fêrxwaz asantir detwanêt beşdarî diyalogêkî be sûd bêt, betaybet katêk hest dekat mamosta mitmaney pêy heye. Mitmane watay ewe nîye mamosta beranber reftarî nayetî raraye û qsey fêrxwaz deselimênê.

Bepêy ezimûn rêjey tengawbûnî fêrxwaz le mawey giftûgoda zor berze û hewil û teqelay xo be bêgunae zanîn û rewayetî pêdan be kirdewekanî xoy şitêkî asayîye. Nîşaneyekî bawî em kesane biçûkkirdinewey rolî xoyane, wek baş lebîryan nîye, rûdawekan wek yarî û galte wesf deken, cexit leser kesanî dîke û rolyan gewre dekenewe. Herweha zorbey çepêner tîşk dexene ser reftarî çepênirawan û ewan be berpîrs dadenên. Wek pêşandanî reftarî fêrxwazî çepêniraw be giştî wirûjêner, hander û gêl dadenên. Lêreda zor girînge mamosta firîwî em qşane nexwat û neyselîmênît, tenanet ger bizanêt qşekanî taradeyek rastin.

Bêguman taradeyek selimandinî em şêwe boçûne yarmetîdere bo dirustbûnî diyalogêkî qûltir, belam sûdekey zor birnakat. Le katêkî wada çepêneran yekser hest be pêwaney rexneamêzî mamosta beranber be fêrxwazî çepêniraw deken û le doxî pêwîstda dijî mamosta û fêrxwazîş bekarî dehênin. Herweha nabêt giftûgo derbarey rolî çepêner û kesanî dîke bikirêt. Bêguman çepêner baş şarezay giftûgoy lem babeteye û mamosta derwestî nayet. Lem beşeda nabêt mamosta layengîr bêt beranber bew şitaney çepêner derbarey xoy, çepêniraw û kesanî dîke basî dekat. Ew kat raw boçûnî çepêner derbarey xoy û kesanî dîke her bo xoy demênêtewe. Em helwêst negirtine (bêlayênîye) y mamosta

debête hoy guman û dûdilî lay çepêner ke mamosta çende derbarey kêşeke dezanêt û em be guman xistiney çepêner be sûde bo proseke.

Lêreda dekirêt derfet bideyn be çepêner bo peydakirdinî çareserêk. Lewaneyê pêwîst bê baseke çendpat bikeynewe, belam erikî mamosta gerane bedûway seredawêk le layen fêrxwazewe ser helbdar. Bo nimûne mamosta detwanêt bem şêwe derfet bidate çepêner bo derxistinî seredaw:

“Boye min legel to giftûgo dekem dezanîm to beşdarî le azardanî Aram û minîş em reftaret be hîç şêweyek naselîmênim. Belam deşzanîm to kurêkî jîrît û pêştir çend car pêkewe derbarey çemikî dîke qseman kirdûwe û pêmwaye to detwanît yarmetî Aram bideyt heta lem doxe rizgarî bê”.

Dîsan berdewam debêt: “to kest bînîwe le polekanî dîke bêrêzî be Aram bikat”. Bem şêwe giftûgo be dewrî babeteda desûrênî heta çepêner pêşnyaz yan bijare (elternatîv) yek dexate pêşiman. Yan dekirêt rastewxo be şêwey xwarewe lêy bipirsîn: “pêşnyazî to çîye? Yan çî bikeyn başe heta kotayî bem azardane bînî?”.

Dûr nîye çepêner pêşnyazî bunyadiner û besûd bidate mamosta. Xêra debêt em pêşnyaze werbigirîn û bîkeyne binemay stîratêjîyek. Amanc pabendbûnî fêrxwazî çepênere be kotayî hênan be reftarî nayetîy xoy (çepandin) û niwandî kirdarî başe, betaybet katêk kesêkî dîke bîhewêt azarî Aram bidat.

Encamgîrî le giftûgoy mamosta û reçawgirtinî em xalane

- Helwêstî ciddî çepêner derbarey rûdaweke
- Neselîmandinî peyv û boçûnî nayetîy fêrxwaz beranber be çepêniraw
- Qena`et hênan be fêrxwaz bo dûrîgirtin le diyardey çepandin
- Pabendbûnî fêrxwaz be reftarî ayetî beranber kesî çepêniraw

Giftûgo kotay dêt û mamosta fêrxwazî çepêner debatewe nêw polekey û kesî dûwem bang dekirêt û beheman şêwe giftûgoy legel dekirêt. Le maweyekî kurt û be şêweyekî xêra giftûgokan cêbecê dekirêt bê ewey derfet be çepêner bidirêt peywendî beyekewe bigirin. Paşan hemû çepêner (grûpekeyan) legel mamosta ko debînewe bo biryardan derbarey çonîyetî reftaryan le dahatûda.

Rîzbendî (xalbendî) giftûgokan

Girîngtirîn xalî danîştinekan encamdanî giftûgoy dûqolye. Giftûgo bepêy rîzbendî serewe bayexî xoy heye le çareserkirdinî kêşeke. Em amirazaneş detwanêt karîgerîy başî hebêt le rîzbendî giftûgokan:

- Çi kesêk detwanêt hawkarîyekî başiman bikat?
- Çi kesêk karîgerî (deselatî) zorî heye le ser grûpeke?

Ger fêrxwazêk le grûpekeda karîgerî û deselatî hebû û çawerwan dekirêt wîstî hawkarî têda hebêt, pêwîste yekem kes giftûgo legel ewda encam bidirêt. Ger em danîştine ayetî bêt, dekirêt bibête destpêkêkî baş bo kesî dûwem û zanyarî danîştinî yekem bibête hoy bunyadnanî boçûnêkî sûdmend legel kesî dûwemda.

Giftûgo legal grûp

Katêk giftûgo legal dûwa fêrxwaz kotayî pêhat pê radegeyênîn her le jûreke çawerê bê. Hawkat mamosta derwatewe nêw pol û hemû çepêneran debate lay dûwa kes.

Êstaye mamosta erikî pêkhênan û berêwebirdinî grûp be esto degirêt bo pêşgirtin le çepandin û çandinî boçûn û reftarî ayetî têyanda. Wêray ewe mamosta le rêgey giftûgoy dûqolîyewe hêndêk zanyarî le hemû endamanî grûp destkewtwe, belam hemû fêrxwazan lem doxe dûdiln beranber be yekdî û hîçyan nazanin kê hemû şitêkî bas kirdûwe û kê hawkarî mamostay kirdûwe yan nekirdûwe. Zorbeyan wa bîr dekenewe ke xoyan zanyarî pitiryan be mamosta dabêt. Mamosta le seretay qsekanîda amaje be akamî giftûgokan dekat ke le danîştine dûqolyekan destî kewtwe. Ew detwanêt bilêt akamî danîştinekan ayetî bûwe û be wîstî hemwan rêkkewtîn ke çareserî kêşeke biken. Eger takêkî grûp le giftûgowe dûqolyekanda ray nayetî bû û hîç hîmmeî hawkarî têda bedî nedekira, nabêt mamosta em danîştineş bixate koy giştî û be hemûyanda helbilêt. Ew detwanêt bo nimûne bilêt: “Şoriş to hêndêk dûdil bwît ke çon detwanît yarmetî Aram bikeyt”.

Mebestî serekî kobûnewe rêkxistinewey grûpekeye û gorînî reftaryane beranber be çepênirawan. Bêguman Şoriş boçûnî ayetî la dirust debêt bo ewe le grûpeke ciya nebêtewe mil be hawkarî dedat.

Lem kateda dekirêt mamosta beşdarbûwanî kobûnewe agadar bikatewe ke kêşekekey legal fêrxwazî çepênirawda bas kirdûwe û ew agadare le bestinî kobûneweke. Hawkat debêt rabigeyênêt ke bo xoy pêşdestî kirdûwe û bem kêşeyey zanîwe, nek fêrxwazî çepêniraw. Dekirêt pêyan rabigeyênêt ke her emro xêzanyan lem kêşeyey agadar dekirêtewe, her boye hanyan dedat bo xoyan katêk çûnewe mal basî hemû şitêk biken.

Mamosta dîsan rêkkewtineke dûpat dekatewe: Çepandin her le êstawe kotayî pêdêt û lebatî debê yarmetî fêrxwazî çepêniraw bikeyn. Paşan delêt lem katewe be wirdî çawdêryan dekat û berêweberî fêrgeş le hemû şitêk agadar dekatewe.

Dekirêt mamosta le kotayî kobûnewekeda teknîkî “welamî pêçewane” bekar bînêt, hem bo rêbestin le firîwdan û hem bo aşkirakirdinî boçûnyan û pêdagirî le ser helwêstî dirust: “Aras, to çî dekey ger kesêk azarî Aram bidat. Asane bot, toş bê westan beşdarî dekeyt le azardanîda?”

Asayîye fêrxwazan eme neselimênin. Mamosta dekirêt dawa le hemûyan bikat yek be yek be dengî bilind bilên ême îdî Aram naçepênîn (azarî) nadeyn. Fêrxwazan bem şêweye dilnya debinewe le helwêstî yekdî û xoyan peywest deden be doxêkî civatî beranber be grûp û mamosta. Eger tenya yek çepêner le polda hebêt, mamosta dekirêt her le yekem giftûgoda teknîkî “welamî pêçewane” bekar bînêt. “welamî pêçewane” dekirêt be şêwey pirsiyar yan pêçewaney welamî ew pirsiyarey detewêt arastey beranberî bikeyt sûd wergirêt bo “aşkirakirdinî” helwêst, boçûnî yan bertek (kardanewe) y le doxî taybetda.

Sereray emeş dekirêt sûd lem teknîke werbigirîn û bizanîn katêk çepêner hevalanî dîkeyan le polda debînin çî rû dedat. Be dilnyayewe fêrxwazanî dîke derbarey kobûneweke pirsiyaryan lêdeken. Her boye mamosta detwanêt dane dane pirsiyaryan lêbikat ke deyanewêt çî welamêk bidenewe. Yan dekirêt mamosta le çepêner bipirsêt, yekem car fêrxwazî çepênirawtan le dûway em kobûnewe bîni çî pêdelên? Lêreda mamosta detwanît pêşnyazêkiyan pêbikat.

Paşan katî kobûnewey dahatû diyarî dekirêt ke mamosta daway zanyarî dekat derbarey çonîyetî rewteke. Nabêt le mawey 2-4 roj pitir le nêwan kobûnewey yekem û dûwemda têperît.

Bo encamgirîy kobûneweke, dekirêt amaje bikeyn be nêwerokî xalekan:

- Zanyarî

- Pabendbûn
- Qûlbûnewe le çemik
- Agadarîy derbarey dîvçûn
- Diyarîkirdinî katî kobûnewe
- Bekar hênanî welamî pêçewane

Car heye dekirêt fêrxwazî çepêniraw le kotayî kobûnewey çepêneran beşdarî pêbikirêt. Sûdî em beşdarî pêkirdine, bûnî mamostaye lew şiwêneda û ew detwanêt peywendyan kontrol bikat.

Pêş hemû şitêk debêt fêrxwazî çepêniraw le seretay prosekeda twana û bergey rûberûbûnewey hebêt û bo xoy bîhewêt le kobûnewe beşdar bêt.

Şewazî destpêkî encamgîryeke wa dest pêdekat ke hemû grûp têkra rêkdekewin kotayî be çepandin bênin û lebatî yarmetî û piştîwanî fêrxwazî çepêniraw biden. Dûwatir mamosta delêt ew pêş başe fêrxwazî çepêniraw bênête kobûneweke û pirsiyareke arastey grûpeke dekat. Ezimûn pêşanî dawey ewan rêgir nîn le hatinî çepêniraw û pêyan başe beşdar bêt, mamosta le çepêner depirsêt, ewan deyanewêt çî bilên be fêrxwazî çepêniraw. Betêkra mamosta û çepêner deron û fêrxwazî çepêniraw le pol banghêşt deken bo jûrî kobûneweke.

Êsta mamosta serî qse dest pêdekat û giftûgoke dexate ger û têdekoşêt akamêkî besûdî lê bedî bikirêt. Dekirêt teknîkî welamî pêçewane bekar bênîn, wek pêştir bas kira. Le kotayîda pêyan rabigeyêne ke to çawerwanît hemû şitêk be çakî birwat, be wirdî çawdêrî barudoxeke dekeyt û berêweberî fêrgeş agadar debêt.

Beşêk le encamgîryeke detwanrêt bibirêtewe nêw pol û mamosta û fêrxwazan pêkewe zanyarî derbarey kobûnewe û rêkkewtineke be hemû poleke rabigeyênin.

Mawey giftûgo leger her yek le çepêner nabêt pitir le 5-10 xulek pitir bêt. Herweha lekobûnewey grûpîş heman kat bekar dênîn. Hawkat çend xulekêk be hatûçoy fêrxwazan le polewe bo jûrî kobûne bekar dêt. Têkra yek kajêr bese bo serleberî kobûnewekan. Ger fêrxwazî çepêniraw bo yekem car beşdarî kobûnewe bêt, pêwîste dû kajêr bê pişû bekar bênîn.

Xêzanî çepêner

Girînge xêzanî çepêner heman rojî kobûnewe leger mindalekanyan dekirêt bo xoşyan agadar bikirênewe. Asantirîn şewaz eweye mamosta her heman roj be telefon xêzaneke banghêşt bikat bo kobûne le dûway katî dewam. Ewkat detwanît bipirsît aye mindalekeyan agadarî kirdunetewe lem base? Wek pêştir xot dawat le fêrxwaz kirdûwe. Berherhal debêt be kurtî zanyarî derbarey kêşeke û giftûgoy mindalekeyan pêbdirêt. Hawkat xêzanî fêrxwazî çepênirawîş debêt agadar bêt lem kobûnewe û pêş rabigeyênrêt ke le giftûgokanda nawî mindalekey dênin.

Car heye çendîn çepêner le kêşekeda beşdar bûne û mamosta debêt le katî wada pirînsîpî “nhênî parastin” le ber çaw bigirêt û kobûneweke wa rêk bixat destkewtî lê bedî bikirêt. Lêreda bo çareserkirdinî kêşe dû şewaz bekar dênîn:

- Hemû xêzanî fêrxwazanî çepêner banghêşt dekirên bo kobûneweyekî giştî. Mamosta pêyan radegeyênêt ke mindalekanyan be kêşey çepandinewe gilawin. Ger ewan em zanyarye

neselimênin û le rûdaw beguman bin, dekirêt dûwatir yek yek banghêşt bikirên bo kobûneweyekî dûqolî.

- Xêzanî her fêrxwazêkî çepêner be tenya bang dekirêt, ew kat mamosta cexit dekate ser reftarî mindaleke û be hîç şêweyek basî çepênerî dîke nakat, dekirêt berêweberî fêrgeş beşdar bêt.

Pirînsîpekan le her dû şewazî destpêk yek core. Xêzan debêt be gerimî û şewazêkî dostane pêşwazyan lêbikirît. Debêt agadar bikirên le çonîyetî giftûgo legel fêrxwazî çepêniraw, xêzanî û mindalekey xoy derbarey akam û şewazî çareserkirdineke. Be kurtî û konkirêt basî rûdawî çepandin dekeyn û amaje bew rêkkewtineş dekeyn ke mindalekanyan belênyan dawê waz le çepandin bihênin û lebatî ew kare, bibine yarîder û piştîwanî kesî çepêniraw. Eme xoy lexoyda selimandinî diyardekeye le layen çepênerewe û nehêştinî gumane lay xêzan. Hawkat mamosta be puxtî û konkirêt basî şewazî dîvçûn û çawdêrî mindalekan dekat.

Dûwatir basî hawkarî dekeyn û xêzan handedeyn bo amojgarî mindalekanyan û çawdêrîkirdinyan lêrebedûwawe. Begîştî zorbey xêzan yarmetî û piştîwanî xoyan le hewil û têkoşanî fêrge bo çareserî kêşeke pêşan deden û amadey hemû core hawkarîyekin. Car heye keşî giftûgo beberyewe heye mamosta basî mêtudî hêwrkirdinewey barudoxî çepêniraw le pol û baştirkirdinî peywendî nêwanyan bikat.

Carî waş heye xêzan deyanewêt bizanin mindalekeyan heta çî radyek beşdarî le çepandinda kirdûwe, yan dûdiln ke diyardey çepandin rûy dabêt... Sûdî niye mamosta bikewête wirdekarîy kêşeke, belam be kurtî pêdabigirêt le girîngî çareser û nehêştinî diyardeke. Eger neyan selimand û daway rûnkirdinewey pitiryan kird, dekirêt pêşnyazî danîştinêkî niwê bikirêt ke berêweberî fêrgeş lewê beşdar bêt. Zorcar xêzanî dîke le kobûnewey yekemda destpêşxerî hawkarî dekat û debête hoy nehêştinewey guman û pêkhênanî hawkarî hemû layek. Ger her kolî neda paş têperbûnî hefteyk bepê şewazî dûwem reftarî legel dekeyn.

Le şewazî yekem dekirêt xêzanî fêrxwazî çepêniraw le kobûnewey yekem yan dûwem beşdar bêt. Ewkat debêt mamosta dilnya bêt ke xêzanî her dû layen taqet û bergey em doxe degirin, dekirêt pêştir amadekarîy bo kirabêt. Be her hal zorbey xêzanî çepêner pêwîstyan peywendî bigirin legel xêzanî çepênirawda. Ger kesêk le beşdarbûwan neyewêt (xêzanî çepêner) beşdarî kobûnewe bikat, debêt le kotayî kobûnewe basî hokarekey bikat. Pêwîste bizanîn xêzanî em kesane pêwîstyan be piştîwanî û hawkarye û nabêt lome bikirên. Begîştî girînge katêkî dîke bo perepêdan bem peywendye diyarî bikirêt û heta be hemû layek bitwanîn geşe be jîngey çak le fêrge bideyn.

Fêrge paş helsengandî wird detwanît kêşeke be baştirîn şewe çareser bikat bê ewe xêzanî fêrxwazan têyda beşdar bin, paşan zanyaryan derbarey doxeke pêbdirêt yan her pêwîst be agadaryan nekat.

Kobûnewey çepêner û çepêniraw

Eger fêrxwazî çepêniraw le kotayî kobûnewey çepêner beşdar nebêt, dekirêt paş maweyekî kurt kobûneweyekî asayî bo her dû la be beşdarî mamosta rêk bixirêt. Lêreda hem fêrxwazî çepêniraw û hem çepêner debêt agadar bin le astî peywendyan be mamostawe. Katêk kêşeke xerîke çareser debêt û mamosta razîye le pêşiveçûnî doxeke, her dû layen detwanin be serpereştî mamosta kobibinewe. Babetî giftûgo lem kobûnewe pêdaçûnewey kêşekane, giwêgirtin le beserhat, hest û

ezimûnî talî fêrxwazî çepênirawe, ger danîştineke sûdbexş bû, dekirêt planrîjî bo kobûnewey dîkeş le dahatûda bikirêt. Car heye dekirêt fêrxwazî dîkeş beşdarî giftûgo bêt. Helbet merc nîye em şewaze be take rêge û baştîrîn şewazî çareser bo hemû doxêk bizanîn.

Dîvçûn û çawdêrî

Kobûnewey grûp debêt berdewam bêt heta kêşeke çareser dekirêt û doxî pol seqamgîr debêt, belam detwanîm mawey nêwan kobûnewekan pitir bikeyn. Bem şeweye mamosta pêşan dedat ke ew peroşî çareserî kêşekeye û wazî lê nahênît. Hawkat çawdêrî fêrxwazî çepênirawîş dekirêt, lanî kem be lêpîrsînewey nawenawe le layen mamostawe. Debêt kobûnewey giştî bo her dû la rêk bixirêt û peywendî nêwan mamosta û xêzanyan berdewam bêt.

Tenya lêkolênnewey mamosta le kêşe ke pirînsîpî serekîye bes nîye, belkû debêt be wirdî çawdêrî û dîvçûnî hebêt. Carûbar hêndêk le kêşekan zor alozin û pêwîstyan be çawdêrîyekî zor û dirêjxayene. Belam carî waş heye be pîrsiyarî kurt ya webîrhênanewey babet peroşî û çawdêrî xot radegeyênît. Emey dûwayîyan betaybet zor sûdbexşe bo pêşgirtin.

Bertek (kardanewe)

Ger grûp belîn û pêkhatinî xoy cêbecê nekat, mamosta detwanêt bepêy rotînî sereta yek be yek lêyan bipîrsêtewe nek be grûp. Dîsan berpîrsayetî dexirêtewe estoy tak û ewca xêzanîş agadar dekirêtewe. Eger bem şeweyeş serkewtû nebûyn le çareserkirdinî kêşeke û çepandîş her berdewam bû, debêt kardaneweman beranberyan hebêt. Dekirêt pêşkat mamosta û fêrge begîştî bîryan le çend kardaneweyek û çonîyetî şewazî cêbecêkirdinî kirdibêtewe bo kotayî pêhênan be kêşeke.

Detwanrêt lîstêk le mêtud û çareser bepêy helkişan û berdewambûnî kêşeke destînaşan bikirêt. Emca bekarhênanî kam mêtud bo kam kêşe dest dedat dekewête estoy mamosta û helsengandî ew le doxeke. Bertek (kardanewe) zor girînge bo binbirkirdinî kêşe, ca çepandineke le layen takewe bêt yan grûp.

Nimûney listî çareser û bertek

- Reftarî çepêner le polda aşkira dekirêt
- Reftarî çepêner le polda giftûgoy le ser dekirêt
- Rûberûkirdinewey çepêner legel xêzanî fêrxwazî çepêner û mamosta
- Rûberûkirdinewey çepêner û xêzanî legel xêzanî fêrxwazî çepêniraw û mamosta
- Le katî pişûda çepêner legel mamostay çawdêr debêt
- Katî pişû debêt çepêner le jûrî mamostayan bimênêtewe
- Yek yan çend kesêk le çepêner debêt polekeyan bo maweyek bigorin, belam nabêt hemûyan bigiwêzrênewe bo yek pol

Car heye dekirêt le seretay prosekewe çepêner agadar bikirênnewe lewey berdewambûnî em diyardeye bertekî dîkey debê. Pêwîst nakat le seretawe basî mêtud û çonîyetî kardanewekan bikeyn. Girîng eweye fêrxwaz bizanêt ger kêşeke çareser nebêt mamosta û fêrge şewaz û kardanewey tundtir bekar dênin û kol naden heta kotayî be kêşe nehênin.

Pêwîste bepêy her kêşeyek çareser û mêtudêk diyarî bikeyn ke lay fêrxwaz wek kardanewe rengbdatewe û karîgerî le ser dabinêt. Katêk çepêneran rûberûy em core kardanewane dekirênewe, nabêt be grûp giftûgoyan legel bikirêt, belkû legel tak takî çepêner. Nabêt şêwazî kardaneweş bo hemû çepêner wek yek bêt. Le doxî wada giftûgokirdin legel grûp û yek şêwaz kardanewe pêşandan beranberyan, debête hoy têkbestinewey û pêkhênanî grûpêkî nayetî.

Fêrxwazanî dîke

Be zorî katêk çepandin rû dedat temaşaçî heye û mamostaş detwanît bizanêt em kesane kê. Dekirêt giftûgo legel takî em fêrxwazane bikirêt û serincyan rabikêşirêt bo ew berpirsayetîyey le estoyane beranber heval. Zorcar fêrxwazî cêmitmane û peroşdar le polda heye bo em berpirsayetîye. Betaybet ger em kesane pley komelayetyan beriz bêt û xoşewîst bin le polda û detwanin sûdbexş bin le rakêşanî hevalan bo yarmetî û piştîwanî fêrxwazî çepêniraw. Ger katêk çepandin rû dedat temaşaçyan yarmetî kesî çepêniraw biden, karîgerî zor debêt bo pêşgirtin lem diyardeye. Hawkat dekirêt hawpolanî dîkeş han bideyn bo dostayetîkirdinî fêrxwazî çepêniraw.

Kur û kiç

Katêk çepandin le layen kur, yan kur û kiç pêkewe rûdeda/dekirêt, karîgerî tundtire lewey kiç be tenya deymat. Betaybet katêk kiçan yekdî deçepênin, zor esteme bitwanîn diyardeke diyarî û pêname bikeyn. Her boye zor car asantire bo kiçan kirdewe û reftarî nayetî xoyan le doxî wada bişarnewe û neselimênin, mamostaş destewestan û bêbelge le bazineyekî boşda bêhîwa bimênêtewe.

Le hemû kêşeyekda girînge û pêwîste mamosta pêdagir bêt beranber be çepêneran ke çepandin rûy dawê û dawakare be bê hîç biyanûyek kotayî pêbênin. Em şêwazî destpêke kilîlî çareserî kêşeye û tenanet le çepandinî kiçanîşda rolî serekî debînêt. Mamosta detwanêt tenha giwêgir bêt le ravey bêbinema û biyanûy çepêner, ewca kurt û puxte dawakaryekey xoy dûpat bikatewe ke le êstawe kotayî be çepandin bihênin.

Dîsanîş dûpatî dekeynewe ke şêwazî destpêk zor girînge, katêk çepêner banghêştî giftûgoy dûqolî dekirên pêwîste mamosta mitmaney tewawî be xoy bêt û kol nedat. Wek le barî derûnnasîda ezimûn kirawe lêkdanewe le ser rabirdû hîçî lê şîn nabêt, girîng serincdane be dahatû.

Corî alozî çepandin

Ew nimûnaney pêştir bas kiran, wek çepandinî fêrxwazêk le layen fêrxwazêkî dîke yan grûpêkewe şêwazî sakarî em diyardeyen. Merc nîye kêşe hemîşe tenha bem şêweye rû bidat. Car heye fêrxwazêk yan grûpêk çendîn kes be şêwey ciyawaz deçepênît. Carî waş heye fêrxwazêk le layen çendîn tak yan grûpewe deçepêndirêt.

Merc nîye fêrxwazêk tenha le yek kes û destewe bête çepandin. Hîç dûr nîye em fêrxwaze le layen çendîn fêrxwaz yan grûpî dîkeşewe biçepênrêt. Her boye pêwîste le seretay karda rûberêkî firewantir bideyne ber peycorî û şîmaney eweş bikeyn ke çepênerêk detwanît çendîn tak biçepênêt. Le barî wehada debêt çendîn mamosta bo gorînewey zanyarî û bekarhênanî mêtudî ciyawaz, pêkewe hawkar bin. Em core hawkaryeş karîgerîyekî behêz û ayetî heye le ser jîngey fêrge begîştî.

Çareserkirdinî kêşe le polda

Katêk mamosta deyewêt kêşeyekî çepandin le polda bixate berbas, pêwîste pêştir astî reftarî polekey begîştî helsengandbêt û bizanît bergey em berengarîye degirêt yan na. Pol heye karêkî zorî têda kirawe bo firajûtinî layenî civakîy fêrxwazan. Standard û normî reftarî baş lem polaneda regî dakutawe. Her boye asantire kêşey çepandin bixirête berbas û giftûgo û akamêkî ayetî û bunyadinerî lê bedî bikirêt heta le polêk ke grûpêk çepêner bûnete sîmbolî hemû reftar û boçûnêk.

Le hêndêk polda grûpî nayetî behêz hen ke karîgeryan leser dîd û reftarî giştî danawe. Boye girînge pêşekî kar legel em grûpaneda bikirêt. Emca le kobûnewey polda em kesane detwanin wek hevalyanan pabend bin be norm û standardî pol. Her em rewte debête hoy firajûtinî kontrolî komelayetî û geşe sendinî reftarî ayetî berdewam le fêrgeda.

Car heye yek ya çend kesêkî kem le polda be çepandinewe degilên. Lewaneye tenya yek çepêniraw le polda bêt û çepêner le polekanî dîke bin. Ewkat mamosta detwanît şewaz û mêtudî çareserî kêşe rastewxo bo astî pol bekar bihênêt.

Lêreda demanewêt be kurtî amaje bew qonaxane bikeyn ke babetî çepandin le kobûnewey polda dexate ber bas û peycorî.

Amadekarîy

Pêwîste basî reftar begîştî le seretawe bikewête jêr çetirî babetî çepandinewe, lêreda mebestiman rêkxistinî normî grûpe. Sereray bûnî karîgerî giştî le qsekanda, pêwstiman be rayekî hawbeş heye le polda ke dûrî bigirêt le çepandin û karîgerîyekî behêz leser çepêner danêt. Be corêk ew wa hest bikat le nêw polda kes piştîwanî le kirdewekanî nakat.

Derxistin / bercestekirdin

Katêk normî xwaziraw cêgîr kira, debêt mirov derxistin helsengênêt û bizanêt heta çi radeyek pêwîste dirêjey pêbdirêt. Dekirêt mamosta nawî çepêner û çepêniraw bênêt? Dekirêt fêrxwazî çepêniraw û çepêner xoyan binasênin?- yan dekirêt em babete be nihênî giftûgoy leser bikirêt?

Eger mamostay pol pêştir giftûgoy legel fêrxwazî çepêner yan çepêniraw kirdibêt, bêguman amadekarî bo kobûnewey pol kirdûwe û lewêda rêkkewtûn ke nawekan aşkira biken yan ne, ger wîstyan “aşkira bêt” kê bîkat. Ger wîstyan nawekan aşkira biken, pêwîste berêzewe bas bikirên. Mirov debêt berêzewe reftar legel çepêner bikat, belam şewey reftarekeyan neselimênêt.

Nimûne û bijare (elternatîv) yek bo ewey bederxistin sinûrdar bikeyn dekirêt bilêyn, lem poley êmeda çepandin heye, çonîyetî rûdanî çepandin, le kiwê rû dedat, rolî temaşaçyan çîye û htd... Bê ewe nawî beşdarbûwan aşkira bikeyn.

Helsengandin

Mebest lêreda ragorînewey fêrxwazane derbarey kêşey reftar û helwêstgirtinyan. Pirsiyare serekîyekan dekirêt derbarey helebûnî çepandin le hemû barudoxêkda bêt, yan boçî çepandin

heleye. Zor girînge fêrxwazan le katî hêlsengandin û encamgîrîda serincî tewaw bidene baseke û beşdar bin têyda.

Planrêjî

Qonaxî dahatû planrêjye le çonîyetî helwêstgirtinî fêrxwazanî pol beranber be çepandin. Bêguman êsta fêrxwazan şarezayî zoryan derbarey ew doxane heye ke fêrxwazî çepêniraw têyda tengaw debêt, ewan detwanin planêk danên bo endamanî pol ke le doxî wada çî sûdbexşe û çî ziyabexşe bo ew fêrxwaze. Lewaneye poleke guncaw bêt bo pêkhênanî torêkî dostane û civakî le dewrî kesî çepêniraw.

Pabendbûn

Le kotada debêt fêrxwazan pabend bin bew plan û pêkhatiney dayan riştwe derbarey reftarî ayetî û dij be çepandin. Pabendbûneke debêt peywest bêt be wîst û belênî fêrxwazewe heta karîger bê. Ew pabendî û belênnameye be şewey nûsiraw yan zarekî le pêşçaw hevalan û mamosta debestirêt, karîgerîy behêztire le selimandinêkî bê deng û rengî kotay kobûnewe. Le hêndê fêrgeda belênname be şewey raportname (hemû fêrxwazêk raportnameyek derbarey çepandin û kem û zorî le pol yan fêrge dedat be mamosta) dîvçûnî bo dekirêt. Bêguman bem core reftarî ayetîy planrêj cêgîrtir dekat.

Ragirtin / aga lêbûn

Kêşeke nabêt be hîç corêk bixirête lawe, tenanet ger akamî kobûnewey polîş zor ayetî bûbêt. Mamosta debêt reftarî ayetî biparêzêt û nawenawe babeteke bènête berbas. Ew bem şeweye detwanêt berdewam agadarî rewişî poleke bêt û pêşkat ber be çepandin bigirêt.

Em şewaze nimûneyeke le çonîyetî bekarhênanî kobûnewey pol katêk çepandin debête kêşe. Kobûnewey pol bem saxtar û sîstemewe debête amirazêkî karîger bo berbestin le diyardey çepandin.

Kobûnewey xêzanî pol

Ger bimanewêt kêşeyekî konkirêtî çepandin le kobûnewey polda bixeyne berbas, debêt fêrxwazî çepêniraw û xêzanî ew fêrxwaze, baskirdin û şewazekey beselimênin. Le katî banghêstkirdin bo kobûneweda bo nimûne dekirêt binûsîn, le ber peroşîman bo poleke û firajûtinî diyardeke, pêwîste kêşeke be aşkira giftûgo bikirêt. Em mêtudeş detwanêt sûdbexş bêt ger çepandin le layen çendîn fêrxwazî polewe berêwe biçêt û taradeyekîş wek ferhengêkî nayetî dijî yek yan çend fêrxwazêk bekar bihêndirêt.

Kobûneweke debêt planrêjî başî bo kirabêt û be pêşekîyekî giştgîrewewe dest pêbikat. Dûwatir pêşkeşkar basî kêşeyekî konkirêt dekat. Mamosta yan xêzanî fêrxwazanî çepêniraw nawî fêrxwaz aşkira deken û tîşk dexene ser ew barudoxe. Mamosta debêt stiratêjîyekî amadekirawî hebêt bo

welamdane. Ger pirsiyar derbarey nawinîşanî çepêner kira, mamosta delê em dîdare bo welamî lew babete nîye.

Mebestî serekî kobûnewe msogerkirdinî hawkarî û piştîwanî xêzane le fêrxwazanî pol. Şêwazêkî baş bo destpêk detwanît derfet bidat be xêzan bo ragorênewe û giftûgoy kêşeke le grûpda û grûpekanîş debêt le layen mamostawe diyarî bikirên. Paşan grûpekan welamekanyan pêşkeş deken.

Bêguman em şêwazî destpêke pêwîstî be koşîşêkî zore û mamosta detwanêt bo planrêjî kobûnewe û berêwebirdinî daway yarmetî bikat le berêweberî fêrge yan yekêk le endamanî encumen. Legel emêşda hebûnî peywendî baş le nêwan fêrge û xêzan û radey hawkarîyan detwanît bibête platforimêkî baş bo dîdarî lem babete.

Dîvçûn

Çepandin bo çepênirawan şikandine û şadîyan kiz dekat û xonorîn (têrwanînyan beranber be xoyan) dekewête ber hereşe. Hêndêkiyan tûşî dilerawkê û xemokî debin. Barudoxî azarderanîş nayetî debêt. Rêzyan bo mafî mirovekanî dîke dadebezêt û riwange û şêwazî helsûkewtyan nayetî debêt û dûwatir tûşî kêşey komelayetî debin. Hêndêkîşyan tûşî nexoşî derûnî debin.

Zor girînge bo fêrge progiramêkî karîger û tokimey bo nehêştinî çepandin hebêt. Hem karîgerîy ayetî tewawî jêngekey pê behêz debêt û hem nawbangêkî başîş peyda dekat. Sereray pêşgirtin be diyardey çepandin, pêwîste çawdêrî û dîvçûnêkî baş lew fêrxwazane bikat ke bem kêşeyewe gilawin. Em kare hem yarmetîdere le pêşgirtinî û hem fêrxwazanîş deparêzêt. Lewaneye bo kesêk ke maweyekî zore azar dedirêt asûdeyî bêt, katêk debînêt mamosta yan gewresalan le fêrge peroşî ewyane û çawdêrî deken. Hêndêk kesî çepêniraw pêwîstyan be mîkanîzimêkî rêkûpêke bo hemwarkirdinî barî derûnyan û yarmetîdanyan le xoguncandin û hawbeşkirdinyan le hemû çalakîyekî polda.

Debêt çepênerîş çawdêrî û dîvçûnyan bo bikirêt, mamosta debêt nawenawe belênnameyan webîrbênêtewe. Raste eme kontrolkirdine, belam peroşî û serpereştyaneye ger berêzewe encam bidirêt. Lem rênimayeda bayexêkî zor dedirêt be pêşgirtin û nehêştinî çepandin, belam dawakarîşe ke çepêner le katî çareserkirdinî kêşe û dûwatirîş wek mirovêk berêzewe reftarî legel bikirêt. Zorbey çepêner beşêk le nasnamey xoyan peywest deden be rolî çepandinewe. Fêrge be rêzgirtinî fêrxwaz wek mirov û rêniwênîkirdinî le cêbecêkirdinî erikî bunyadiner û sûdbexş hem standardêkî baş dekate ferheng û hem xizmetêkî gewreşî pêdekat. Lewaneye çepêner hebin pêwîstyan be planêkî taybetî çawdêrî bêt.

Beşî heştem

Encamgîrî

Nêzîkey 60-70 hezar fêrxwaz heftane tenya le yek şarêkî welatî norwêjda be çepandinewe degilên, em rêjeye her dû layenî çepêner û çepêniraw degirêtewe û hezaran kesîş carûbar bem kêşeyewe degilên. Sereray emeş hezaran kesî dîke rojane (narastewxo) - wek temaşaçîy çalak û pasîv - beşdarî çepandin debîn.

Ezimûn selimanduyetî karî sîstematîk û amancî diyarîkiraw le astî hem tak û hem grûpda karîgeryekî bêhawtay debêt le pêşgirtin be diyardey çepandin. Mamosta wek berêweberî pol amiraz û babetî fêrkarî zorî leber destdaye bo guncandinî babetî dij be çepandin û kar pêkirdinî le nêw polda.

Katêk çepandin debête kêşeyekî serekî, kargêranî fêrge û mamosta berpirsin le peycorî û çareserkirdinî le rêgey mêkanîzimî çirî giftûgo û standardêkî çalakî reftar û siza, fêrge detwanêt diyardey çepandin le binewe rîşekêş bikat.

Fêrge bo pabendbûn û becêgeyandinî berpirsayetî le pêşgîrîy çalakane dijî diyardey çepandin, detwanêt le rêgey plan bo çareserî tokimewe kotayî be kêşeke bihênêt.

Bêguman kempîn û çalakî rojane û heftane dijî çepandin karîgerîy xoy heye, belam karî sîstematîk û dirêjimewdaye ke baştirîn encamî lê dezê. Hawkat fêrge le pêşgirtinî sîstematîk beranber be kêşey çepandin sûdêkî zorî pêdegat ke be giştî debête hoy pêşgirtin le reftarî napesendî dîke û firajûtinî jîngeyekî şad û reftarî ayetî le fêrge û civatda.

«...»